DÎTAM
NAVENDA LÊKOLÎNÊN
CIVAKÎ YA DÎCLE



DI TENDURISTÎYÊ DE PIRSGIRÊKA ZIMAN:
MÎNAKA AMEDÊ

Yên ku alîkarî
dane vê lêkolînê:
Odeya Dermansazên Diyarbekir,
Odeya Bijişkên Diyarbekir
Odeya Dermansazên Batman,
Enstîtuya Civaka Vekirî,
Hedef Allîance

Ray û ramanên ku di raporê de cîh
digrin ray û ramanên DÎTAMê ne;
bi saziyên alîkar re pêywendiyê xwe tune ne.

Adar, 2012

Sıpasî

Di rêvebirina
vê projeyê de
Prof. Dr. Gunay SAKA û
Doç. Dr. Rustem ERKAN
zanistiyên xwe yên
hêja bi me re
parve kirin.
Ji ber vê
alîkariyê em
sipasiya wan dikin.

Rêvebirina Projeyê:

Li ser navê DÎTAMê Serok : Dermansaz Mehmet KAYA
Rêvebirên Projeyê : Îlhamî BÎRKAN
Ecehan BALTA
Cihan AY

Koma Şêwrê ya Zanistî:

Endamên Koma
Tenduristî ya DÎTAMê
1. Bijişkê Pispor Hasan Guneş
2. Bijişkê Pispor Selîm Olçer
3. Bijişkê Pispor M. Emîn Ulug
4. Dermansaz Mesût Azîzoğlu
5. Dermansaz Mesût Ekîn

Têdayî

1. DESTPÊK
2. ARMANCA LÊKOLÎNÊ
3. TEHER
4. DANEYÊN LÊKOLÎNÊ
5. GENGEŞÎ
6. ENCAM
7. PÊŞNIYAR

Rêzkirina Tabloyan

Tablo I. Bijişkên li Diyarbekir ya bi gorî belavbûna pisporiyan
Tablo II. Bi gorî zayendan, bijişkên ku wekî mînak hatine hilbijartin
Tablo III. Bi gorî cîhên kar, bijişkên ku wekî mînak hatine hilbijartin
Tablo 1. Bijişkên bi gorî emir û zayendê xwe bûne babeta lêkolînê
Tablo 2. Dermansazên bi gorî emir û zayendê xwe bûne babeta lêkolînê
Tablo 3. Bijişkên bi gorî pisporî û dezgehên lê dixebitin bûne babeta lêkolînê
Tablo 4. Bijişkên bi gorî zimanên ji bilî tirkî dizanin bûne babeta lêkolînê
Tablo 5. Belavbûna bijişk û dermansazên bi gorî zimanê zikmakî bûne babeta lêkolînê
Tablo 6. Belavbûna dermansazên bi gorî zimanên ji bilî tirkî dizanin bûne babeta lêkolînê
Tablo 7. Belavbûna bi gorî zimanê zikmakî û zimanê pêywendiyê ya ku bi nexweşan re bi zêdeyî tê bikaranîn de, bijişkên ku bûne babeta lêkolînê
Tablo 8. Belavbûna bi gorî zimanê pêywendiyê ya ku bi nexweşan re bi zêdeyî tê bikaranîn de, dermansazên ku bûne babeta lêkolînê
Tablo 9. Bi gorî zimanên ku nexweşan di pêywendiyê de herî zêde bi bijişkên ku bûne babeta lêkolînê bikartînin
Tablo 10. Bi gorî pirsgirêkên ziman ya pêywendiyê ya bi nexweşan re belavbûna emir û zayenda bijişkên ku bûne babeta lêkolînê
Tablo 11. Bi gorî pirsgirêkên ziman ya pêywendiyê ya bi nexweşan re belavbûna emir û zayenda dermansazên ku bûne babeta lêkolînê
Tablo 12. Bi gorî muqayesekirina zimanên dayîke ya bijişkên jin û mêr ku usa difikirin ku ji ber vê sedemê bi pêywendiyên xwe yên nexweşan re pirsgirêkan dijîn
Tablo 13. Bi gorî pêywendiyê zimanên nexweşan ya ku herî zêde bikartînin de muqayesekirina pirsgirêkên ziman
Tablo 14. Bi gorî zimanên dayîkê ya bijişkên ku bûne babeta lêkolînê, muqayesekirina riyên pêywendiyê ya bi nexweşên ku bi tirkî nizanin
Tablo 15. Belavbûna riyên jihevfamkirinê ya bi nexweşan re ya bi dermansazên ku bûne babeta vê lêkolînê

Tablo 16. Muqayesekirina bi gorî zimanê dayîkê ya bijişkên ku bûne babeta vê lêkolînê ku bi nexweşên tirkî nizanin û yên ku daxwaza axaftina zimanê dayîkê dikin û zimanê wan ê dayîkê jî ne tirkî ye
Tablo 17. Belavbûna pêywendiyên bi gorî zimanê dayîkê û bersîvên ku li hember pirsa didin ya bijişkên ku bûne babeta vê lêkolînê
Tablo 18. Belavbûna hin ray û ramanên dermansazên ku bûne babeta vê lêkolînê ku di pêywendiyên nexweşan de pirsgirêkên bingehziman dijîn
Tablo 19. Belavbûna bersîvên bijişkên ku li hember pirsa “Dema ku nexweş famdike ku hûn zimanê dayîkê yê/ya wî/wê dizanin li hember we çi helwest digre.”
Tablo 20. Belavbûna bersîvên dermansazên ku li hember pirsa “Dema ku nexweş famdike ku hûn zimanê dayîkê yê/ya wî/wê dizanin li hember we çi helwest digre.”
Tablo 21. Bi gorî bijişkên ku bûne babeta vê lêkolînê li Diyarbekir di pêywendiyên nexweş û bijişkan de pirsgirêkên ziman
Tablo 22. Bi gorî dermansazên ku bûne bebate vê lêkolînê li Diyarbekir di pêywendiyên nexweş û dermansazan de pirsgirêkên ziman
Tablo 23. Bi gorî zimanê dayîkê yên bijişkên jin û mêr, li Diyarbekir muqayesekirina pirsgirêkên ziman ya di pêywendiyên nexweş û bijişkan de têne dîtin
Tablo 24. Bi gorî zimanê dayîkê ya bijişkan hûrnêrîna komên ku pirsgirêkên pêywendiyê ya herî zêde tên dîtin
Tablo 25. Belavbûna bersîvên dermansezên ku di pêywendiyê de bi gorî emir, zayend û ciyên ku jê hatine, pirsgirêkên herî zêde tên dîtin
Tablo 26. Bi gorî zimanê dayîkê ya bijişkan belavbûna hin nêrînên wan
Tablo 27. Nêrînên dermansazên ku bûne babeta vê lêkolînê yên li ser zanîna ziman, rewşa memnuniyeta karkirina ji Diyarbekir û karkirina li ciyê ku bi nexweşan re dikarin bi heman zimanê re pêywendî bigrin
Tablo 28. Belavbûna pirsgirêkên dermansaz û bijişkên ku bûna babeta vê lêkolînê ku dema karên xwe dikin rûberû dibin
Tablo 29. Pêşniyarên dermansaz û bijişkên ku bûne babeta vê lêkolînê yê li ser, li Diyarbekir pêywendiya nexweş û bijişkan de pirsgirêkên ziman
Tablo 30. Bi gorî bijişkan pirsgirêkên girîng yên Diyarbekir.

RAPORA LÊKOLÎNÊ

Xizmetên tenduristiyê, mafekî bingehîn ya civakî ye ku divê dewlet vê xizmeta bide hemû hemwelatiyên xwe. Tenduristî bi qasî ku mafekî hemwelatiyê ye, her ew qas jî haletekî girîng ya polîtîkayên civakiye jî. Li gelek dewletên cîhanê wezifeya herî girîng ya dewletê ew e ku xizmetên tenduristiyê bi awayekî wekhev bide hemwelatiyên xwe. Newekheviya tenduristî, her çi qas girêdayî bi avahiyên bingehîn, wergirtina xizmetên tenduristiyê û jêderkên ji bo tenduristiyê hatine veqetandin re girêdayî be jî, her ew qas cûdahiya zimanê navbera kesên xizmetên tenduristiyê didin û kesên xizmeta tenduristiyê digrin de jî, jêderkekî newekheviyê ye.

Avakirina civakekî bijûn an jî domkirina civaka di juniya xwe de bêpirsgirêk in, herî zêde girêdayî rewşa pêywendiya navbera nexweş û bijişk e. Di nexweşxaneyan de dermankirina nexweşî û di dermankirinê de serketin, pêywendiyên bi nexweşan re gelek eleqedar e. Her weha nexweşên ku dixwazin xwedermankin, sedemên nexweşiyên xwe bizanibin an jî riya dermankirinê hîn bibin, ji bo vê yekê jî gelek xwezayî ye ku ew ê bixwazin bi bijişkan re pêywendîdar bin. Baş tê zanîn ku heke bijişk nikaribe bi nexweşên xwe re pêywendiyekî baş pêk bîne, bi gotinekî din heke nikaribe nexweşên xwe li hember nexweşiya wî/ê baş agadar bike, karê xwe jî wê bi awayekî esasî neyîne cîh.

Wekî tê zanîn di famkirina nexweş û bijişkan de faktorê herî girîng pêywendî ye. Yên ku astengî ji vê pêywendiyê re derdixe jî, di serî de cûdahiya ziman ya nexweş û bijişk in. Li Diyarbekir di pêkanîna xizmetên tenduristiyê û wergirtina van xizmetan de, ji bilî pirsgirêkên avahiyên bingehîn ku li herêmên din yên li welat tên dîtin, her weha ji ciyên din cûdatir pirsgirêkek zimanî jî tên jiyîn.

Encama herî girîng ku di vê xebatê de derket holê ew e ku her çi qas tu polîtikayê ku dewlet li Diyarbekir xebatkarên tenduristiyê yên kurdî dizanin îstihdam bike tune be jî, jiberxwe ve tê dîtin ku rêjeya bijişk û dermansazên ku li Diyarbekir kardikin û kurdî dizanin, ne hindik in. Ev encam, bêgûman pirsgirêkên ku pêywendiya nexweş û bijişkan de tên dîtin, kêmtir dike. Ev encamê ku jiberxwe ve derketiyê holê heke ji alî dewletê ve jî piştgirî bigre, di çareserkirina pirsgirêkên tenduristiyê de wê alîkariyek mezin çêbibe.

Bi gorî daneyên lêkolînê zimanê zikmakî yên bijişkên li Diyarbekir kar dikin %49,3 tirkî, %47,5 jî kurdî ne. Dermansazên ku li Diyarbekir kar dikin jî zimanê zikmakî yên %21.4ê wan tirkî, %73,8ê wan jî kurdî ye. Di nav bijişkan de %28.5ê wan her çi qas zimanê dayîkê wan ne kurdî bin jî, bi kêmtêrî be jî ji kurdiyê fam dikin. Tenê ji %10ê bijişkan ji kurdiyê qet famnakin. Di nav dermansazan de yên ku kurdî famdikin, nêzî %85 in. Lê di nav dermansazan de yên ku zimanê wan ên dayîkê kurdî ne %73,8 be jî, yên ku dikarin bi kurdî biaxivin %55 in.

Daneyekî girîng ya lêkolînê jî ew e ku bijişkên ku bi nexweşên xwe re pirsgirêkên ziman dijîn bi gorî emir û zayendê wan digûherin. Bi gorî daneyên komên emir ya ku di lêkolînê de derketine holê, bijişkên ku emrê wan di bin 30î de ne %72,5ê wan dibêjin em bi nexweşên xwe re pirsgirêkên ziman dijîn. Ev rêjeya pirsgirêkên ziman di navbera emrên di 30-39an de %62,5, di 40-49an de %68,3 in. Di nav bijişkên ku emrê wan 50 borî ne jî rêjeya pirsgirêka ziman %27,3 ye. Rêjeyên lêkolînê nîşan dide ku pirsgirêkên ziman di navbera bijişk û nexweşên ku zimanê wan ên dayîkê kurdî ne jî pirsgirêkên ziman hene. Bi gotinekî din her çi qas zimanê dayîkê yên bijişkên ciwan kurdî be jî ew bi nexweşên ku kurdî diaxivin re nikarin pêywendiyekî rasteqîn bigrin. Di nav bijişkên jin de yên pirsgirêkên pêywendiyê dijîn %84,7 e. Ev Rêje di nav bijişkên mêr de %58,7 e. Di nav dermansazan de jî em dibînîn ku di yên pirsgirêkên pêywendiyên ziman dijîn de rêjeya jinan bilind e.

Ji %79,3ê bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê kurdî ye em famdikin ku dema nexweşên wan zanin ew kurdî dizanin, zêdetir bawerî bi wan tînin. Ev rêje di nav dermansazan de %71.4 e. Ev encam nayê wê wateyê ku bingeha etnîsiteyê dermansaz û bijişkan zêdetir bawerî dide nexweşan; mirov dikare vê encamê, wekî nexweş wê bikaribe xwe baştir îfade bike û dermankirina wî/ê jî wê baştir bibe, şirove bike. Ev yeka her weha girîngiya pêywendiya navbera nexweş û bijişkan jî eşkere dike.

Di nav bijişkên zimanê wan ê dayîkê tirkî ne û her weha yên kurdî ne jî, rêjeya bijişkên ku di pêywendiyên ziman de bi nexweşên jin re pirsgirêk dijîn, bi gorî nexweşên mêr gelek zêdetir in. Ji %63ê bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê tirkî ne, bi nexweşên jin re pirsgirêkên pêywendiyê dijîn.

Ji van bijişkan tenê %18 dibêjin, di navbera zayendan de cûdahî tune ne. Her weha di nav bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê kurdî ne jî, %69 dibêjin em bi nexweşên jin re pirsgirêkên pêywendiyê dijîn. Dîsa di encamê de derdikeve holê ku bijişk bi nexweşên ku ji navçe û gundan tên re, bi gorî nexweşên ji nav bajêr tên zêdetir pirsgirêkên pêywendiyê dijîn.

Ev rêje di nav bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê tirkî ne %74,5, di nav bijişkên zimanê wan ê dayîkê kurdî ne jî %61,9 in. Sedemên herî mezin ya cûdahiya bi gorî zayend û ciyên lê dijîn ew e ku nexweşên jin û yên ji navçe û ji gundan tên, ji bilî zimanê dayîka xwe nikarin xwe bi zimanekî din îfade bikin an jî zimanek din nizanin. Her weha her ku emrê nexweşan pêşve diçe pirsgirêkên pêywendiyê jî zêdetir dibin. Bijişk herî zêde bi nexweşên ku emrê wan li ser 50 ne pirsgirêk dijîn. Di nav dermansazan de jî heman encam tê dîtin.

Di nav bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê tirkî ne, rêjeya wergirtina xizmetên tenduristiyê û bandora zanîna ziman ya cîhên ku bijişk lê kar dikin, %86.8 in. Ev rêje di nav bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê kurdî ne, % 96,5 in. Di nav dermansazande jî ev rêje %71,4 in. Piraniya bijişkan bal dikşînin girîngiya zanîna ziman û ciyên kar lê dikin û dibêjin, di ciyên ku lê dixebitin û zanîna zimanên nexweşan ji bo wan gelek girîng e. Ev encam jî nîşan dide ku yên xizmeta tenduristiyê didin û yên digrin bi zimanekî bipeyîvin, wergirtina xizmetên tenduristiyê û bandora xizmetan wê zêdetir baş bibe.

Ji bijişk û dermansazên ku beşdarî vê lêkolînê bûne, raya wan a ji bo çareserkirina pirsgirêkên pêywendiyê jî hatin pirsîn. Ji bo kêmkirin û çareserkirina pirsgirêkên pêywendiyê li Diyarbekir, %40î bijişkan bal dikşînin îstihdama xebatkarên ku zimanê herêmê dizanin. Her weha %43,3ê bijişkan jî bal dikşînin rewşa bijişkan û dibêjin, zimanê wan ê dayîkê ne ya nişteciyên herêmê be jî divê yên li herêmê kardikin zimanê wan fêr bibin. Bi vî awayî jî eşkere dibe ku %84ê bijişkan bal dikşînin girîngiya zanîna zimên.

PÊŞNIYAR

- Divê der haq pirsgirêkên pêywendiya ziman yên navbera nexweş û xebatkarên tenduristiyê, lêkolînên berfirehtir werin çêkirin.

- Divê li Diyarbekir û bajarên din yên herêmê ji bilî xebatkarên tirkîaxêv, di serî de yên kurdî û zimanên wekî erebî jî zanin werin îstîhdamkirin.

- Ji xebatkarên ku li herêmê nû destbikar kirin re, bi sazkirina Rêvebiriya Tenduristî ya Bajêr û bi alîkariya sendîka û saziyên pîşeyî yên tenduristiyê ve ji bo pirsgirêkên pêywendiyê kêm bibin û nexweş û bijişk bikaribin hêsatir pêywendî bigrin, kurdî û zimanên din yên herêmê were fêrkirin.

- Di vê xebatê de carekî din derket holê ku pirsa herî mezin di pêywendiya navbera nexweşên jin û emir zêde ku ji gund û navçeyan tên de dixwûye. Ev nexweşana bi bijişkan re piranî bi riya nasekî/ê xwe pêywendî digrin. Ji bo bandora vê pirsgirêka kêmtir bibe pêwîstî bi îstîhdamkirina wergêrên ku tirkî û kurdî baş dizanin heye.

1. DESTPÊK

Li hember pêşketina haletên teknolojiyê ya nasînê, dîsa jî ji hemû aliyên zanistî, tebabet û pisporên tenduristiyê ve wekî rastiyekî zanyarî derdikeve holê ku di nasîn û dermankirina nexweşiyan de faktora sereke "çîroka nexweş" (anamnez) e. Nexweşiyên borî yên nexweş, nexweşiyên genetîk, semptomên nexweşiyê, ji alî bijişk ve zanîna giliyên nexweşiyê di nasîna nexweşiyê de faktora sereke ne. Ji bo ku nexweş bikaribe çîroka xwe vebêje, divê xwe bi zimanê ku herî baş dizane îfade bike.

Her weha dermankirina bi dermanan jî, dumahiya dermankirinê ye û beşa herî girîng e. Sedî 80yî dermankirinan bi reçeteyê ku ji alî bijişk ve tê nivîsandin didome. Karanîna dermanan yên di wexta xwe de, bi awayekî temam û di doza xwe de ji bo pêkanîna başkirinê gelek girîng e. Di vî warî de jî berpirsiyarên herî mezin dermansaz in û ew her weha di karanîna dermanan de şêwirmendiya nexweşan dikin; wê derman çawa, kengî û bi kîjan cûreyî were karanîn, ji nexweşan re didin famkirin. Her weha bi gorî daneyan jî tê zanîn ku tenê li DYAyê salê 400 hezar kes pirsgirêkên bandora bi nakokiya derman-derman, derman-xwarin û alerjiyên dermana dijîn. Ev pirsgirêka tenê bi çîroka karanîna dermanan ya nexweşan dikare were kêmkirin.

Lê ciyên ku zêdetir kurd lê dijîn de piraniya bijişkan bi kurdî nizanin. Her weha di heman herêmê de piranî jin, nêzî 2 mîlyon kes jî bi tirkî nizanin. Ev astengiya ziman dibe sedem ku li herêmê di warê tenduristiyê de mafên tenduristiyê bi awayekî rêkûpêk naye bikaranîn. Ji ber vê pirsgirêkê her çiqas hin caran ji bo bijişkan dersên kurdî, wergêrên ku bi bijişkan re bixebitin wekî çareserî werin lêvkirin jî, heta niha çi xebatekî ku di vî warî de wekî rastiyekî zanistî were bikaranîn, nehatiye çêkirin. DÎTAM, ji bo ku astengiyên di warê tenduristî de tên jiyîn, ango bijişk û dermansazên ku li Diyarbekir dişoxilin zimanê ku li vî bajarî herî zêde tê axaftin (kurdî) çi qas dizanin derxîne holê û bijişk û dermansazên ku bi nexweşan re heman zimanî nikarin biaxivin di xizmetên tenduristiyê de bi çi pirsgirêkan re rûberû dibin, di nasîn û dermankirina nexweşan de, bi vê yekê ve girêdayî di karanîna mafên tenduristî ya nexweşan de rewş çi ye eşkere bike, vê xebata pêkanî ye. Ev lêkolîn her çi qas bi Diyarbekir re hatibe sînorkirin jî, yekemîn xebata li ser van babetên binavkirî ne.

2. ARMANCA LÊKOLÎNÊ

Armanca lêkolînê ew e ku bi gorî bijişk û dermansazan pirsgirêkên bingehziman di pêywendiyên nexweş, bijişk û dermansazan de çi qas bi bandor in were eşkerekirin û her weha ev pirsgirêkên pêywendiyê di wergirtina xizmetên tenduristiyê û dayîna vê xizmetê de çi bandor dike, werin zanîn e.

3. TEHER

Lêkolîn, salixdayinî û sînorkirî ye. Di navbera Îlon-Çiriya Paşîn 2011an de hatiye çêkirin. Lêkolîn, bi bijişk û dermansazên ku li Diyarbekir kardikin re hatiye sînorkirin. Di serî de lîsteya 1824 bijişkên ku li Diyarbekir kardikin ji Rêvebiriya Tenduristî ya Bajêr hatiye wergirtin. Ji bo bijişkan frekansa ku li bernama EpiInfo 2000an de wekî 0,50 tê qebûlkirin 0,40 hatiye wergirtin û bi vê yekê ve girêdayî hecma herî biçûk ya mînakan jî ku navbera baweriyê wekî %95 tê zanîn jî wekî 91 hatiye dîtin. Ji lîsteya bijişkan bi mînakên sîstematîk yek esil û du kesên pê wan jî tên wekî cîgir hatine hilbijartin.

Li Diyarbekir di navendê de 280, ser yek jî 415 dermansaz hene. Ji bo anketan dermansazên ku saziyan de dixebitin, dermansazên serbixwe û dermansazên ku di dermanxaneyên xwe de rasterast bi nexweşan re nakevin pêywendiyê, nehatine hilbijartin. Ev pîvanên hanê bi xebatên hevşîrik ya endamên dermansaz ya komîsyona tenduristiyê ya DÎTAMê û sekreteriya Odeya Dermansazan re hatine tespîtkirin. Piştî vê xebatê anketên lêkolînê, 7 ji wan jin, tevî 42 dermansazan re hatine çêkirin.

Anketên ku ji alî komîsyona tenduristî ya DÎTAMê ve ji bo bijişk û dermansazan hatiye amadekirin, piştî ceribandina ewil bi anketorên perwerdekirî re hatiye domandin. Ji anketoran re agahiyên berfireh hatiye dayîn û destûra wan ên devkî hatiye wergirtin. Piştre jî bi bijişk û dermansazan re ev anketên han hatine çêkirin. Anket ji du beşan pêk tên. Di beşa yekemîn de agahiyên danasînê (anketa bijişkan de 9, anketa dermansazan de 9 pirs) hene; pêy van pirsan jî pirsên li der haq pirsgirêkên pêywendiyê (anketa bijişkan de 27, anketa dermansazan de 24 pirs) di anketan de cîh digrin. (Pêvek 1: Formên Pirsan)

Guherinerên pevgirêdayî ya lêkolînê "pêywendiya bi nexweşan re rewşa pirsgirêkên ziman" e. Gûhrînerên serbixwe jî ev in: Emir, zayend, rewşa medenî, salên kar, pisporî, saziyê lê dixebite, cihên dayîkbûnê û zimanê dayîkê ya bijişk û dermansazan.

Hemû dane di kompîturan de hatine beşkirin û wekî sedyekên îstatîstîkî, nîvekî û khî analîza çarçik hatiye sererastkirin.

Tablo I. Bijişkên li Diyarbekir ya bi gorî belavbûna pisporiyan

	NEXWEŞXANEYA ZANÎNGEHÊ		NEXWEŞXANEYA PERWERDE Û LÊKOLÎNÊ		NEXWEŞXANEYA DEWLETÊ		PÊLA YEKEMÎN		NEXWEŞXANEYÊN TAYBET		BI GIŞTÎ
	JIN	MÊR	JIN	MÊR	JIN	MÊR	JIN	MÊR	JIN	MÊR	
	105	410	70	141	84	277	170	257	43	267	
BRANŞA NEXWEŞIYÊN HUNDIRÎN	336		111		63				216		726
BRANŞA NEXWEŞIYÊN CERRAHÎ	179		100		73				94		446
PRATÎSYEN					225		427				652
SERHEV	515		211		361		427		310		1824

Tablo II. Bi gorî zayendan, bijişkên ku wekî mînak hatine hilbijartin

	Bijişkên qeydkirî		Yên hatine hilbijartin	
	Hejmar	%	Hejmar	%
Jin	472	25,9	59	21,3
Mêr	1352	74,1	218	78,7
Serhev	1824	100,0	277	100,0

X^2 :2,64, p:0,104

Tablo III. Bi gorî cîhên kar, bijişkên ku wekî mînak hatine hilbijartin

	Bijişkên Heyî		Yên Hatine Hilbijartin	
	Hejmar	%	Hejmar	%
Zanîngeh	515	28,2	71	25,6

Wezareta Tenduristî	999	54,8	155	56,0
Taybet	310	17,0	51	18,4
Serhev	1824	100,0	277	100,0

X^2 :0.93, p:0,629

4. DANEYÊN LÊKOLÎNÊ

Tablo 1. Bijişkên bi gorî emir û zayendê xwe bûne babeta lêkolînê

Navbera Emir	Jin		Mêr		Serhev	
	Hejmar	%	Hejmar	%	Hejmar	%
<30	12	20,3	39	17,9	51	18,4
30-39	37	62,7	115	52,8	152	54,9
40-49	9	15,3	54	24,8	63	22,7
50+	1	(1,7)	10	4,6	11	4,0
Serhev	59	21,3	218	78,7	277	100,0

Navbera emrên bijişkên ku bûne babeta lêkolînê 35,8±6,8 (herî kêm 25, herî zêde 62) ye. Emrê %77,6ê vana di navbera 30-49an, %4ê vana jî 50 û ser 50î ne. %78,7ê wan mêr, %21,3yê wan jî ji jinan pêkhatiye.

Ji bijişkan 202 (%72,9) zewicandî, 75 (%27.1) azeb in. Nîvekiya salên xebatê 10,9±7,3 (herî kêm 1, herî zêde 40); xebata salên Diyarbekir jî 6,8±6,3 (herî kêm 1, herî zêde 39) hatiye hesibandin.

Heke em bi gorî pisporiyan wan jî lê binhêrin; 143 bijişk (%51,6) pratîsyen, 72 bijişk (%26,0) pisporên branşên hûndirîn, 62 bijişk jî (%22,4) pisporên branşên cerrahî ne.

Tablo 2. Dermansazên bi gorî emir û zayendê xwe bûne babeta lêkolînê

Navbera Emir	Jin		Mêr		Serhev	
	Hejmar	%	Hejmar	%	Hejmar	%
<30	2	25,0	15	44,1	17	40,5
30-39	4	50,0	12	35,3	16	38,1

40-49	2	25,0	7	20,6	9	21,4
50+						
Serhev	8	100,0	34	100,0	42	100,0

Navbera emrên dermansazên ku bûne babeta lêkolînê 33,4±7,3 (herî kêm 25, herî zêde 59) ye. Ji vana 29 (%69.0) zewicandî, 13 jî (%31) azeb in. Nîvekiya salên xebatê 9,1±7,9 (herî kêm 1, herî zêde 37); xebata salên Diyarbekir jî 8,2±7,0 (herî kêm 1, herî zêde 37, nîvekî 6) hatiye hesibandin. Ji 42 dermansazan 37 (%88, 1) li navenda Diyarbekirê, 5 (%11.) li navçeyan kar dikin. Ji vana 9 (%21,4) dermansaz zimanê wan ê zikmakî tirkî, 31ê (%73,8) wan jî kurdî ye.

Tablo 3. Bijişkên bi gorî pisporî û dezgehên lê dixebitin bûne babeta lêkolînê

	Pratîsyen		Pisporê Hûndirîn		Pisporê Cerrahî		Serhev	
	Hejmar	%	Hejmar	%	Hejmar	%	Hejmar	%
Nexweşxana Dewletê	20	14,0	37	51,4	23	37,1	80	28,9
Nexweşxana Taybet	10	7,0	20	27,8	21	33,9	51	18,4
Nexweşxana Zanîngehê	38	26,6	15	20,8	18	29,0	71	25,6
Pêla Yekemîn	75	52,4	-	-	-	-	75	27,1%
Serhev	143	100,0	72	100,0	62	100,0	277	100,0

Dema bi gorî saziyên lê dixebitin werin çavlêkirin; ji bijişkan %28,9ê (80 kes) wan li nexweşxaneyên dewletê, %18,4ê (51 kes) wan li nexweşxaneyên taybet, %25,6ê (71 kes) wan li nexweşxaneyên zanîngeh û %27,1 (75 kes) jî li saziyên tenduristî ya pêla yekemîn de dixebitin. 208 bijişk (%75,1) li navenda Diyarbekir, 69 (%24,9) jî li navçeyan xebatên xwe didomînin. Ji %49,5ê bijişkan zimanê zikmakî ya xwe wekî tirkî, %47,3 jî wekî kurdî binavkirine.

Tablo 4. Bijişkên bi gorî zimanên ji bilî tirkî dizanin bûne babeta lêkolînê

	Bê bersîv		Qet famnake		Famdike, nikare biaxive		Famdike û diaxive	
	Hejmar	%	Hejmar	%	Hejmar	%	Hejmar	%
Kurdî	36	13,0	29	10,5	79	28,5	133	48,0
Erebî	163	58,8	75	27,1	24	8,7	15	5,4
Îngîlîzî	65	23,5	13	4,7	83	30,0	116	41,9

Têbinî: Sedyekan bi gorî serhevkirina rêza berehî hatiye hesibandin.

Tablo 5. Belavbûna bijişk û dermansazên bi gorî zimanê zikmakî bûne babeta lêkolînê

	Bijişk		Dermansaz	
	Hejmar	%	Hejmar	%
Tirkî	137	49,3	9	21,4
Kurdî	132	47,5	31	73,8
Yên Din	9	3,3	2	4,8
Serhev	278	100,0	42	100,0

Tablo 6. Belavbûna dermansazên bi gorî zimanên ji bilî tirkî dizanin bûne babeta lêkolînê

	Bê bersîv		Qet famnake		Famdike, nikare biaxive		Famdike û diaxive	
	Hejmar	%	Hejmar	%	Hejmar	%	Hejmar	%
Kurdî	0	-	6	14,3	13	31,0	23	54,8
Erebî	3	7,1	34	81,0	3	7,1	2	4,8
Îngîlîzî	2	4,8	10	23,8	18	42,9	12	28,6

Têbinî: Sedyekan bi gorî serhevkirina rêza berehî hatiye hesibandin.

Bijişkên bûne babeta lêkolînê, ji vana %48.0 ji kurdî famdikin û dikarin biaxivin. Ev hejmar bi zimanê zikmakiyê wan re hevaheng e. Ji dermansazan jî &73,8 dibêjin zimanê me yê dayîkê kurdî ye, lê yên ku dikarin kurdî fambikin û biaxivin %54,8 e.

Tablo 7. Belavbûna bi gorî zimanê zikmakî û zimanê pêywendiyê ya ku bi nexweşan re bi zêdeyî tê bikaranîn de, bijişkên ku bûne babeta lêkolînê

	Zimanê Dayîkê				Serhev	P
	Tirkî		Yên Din*			
	Hejmar	%	Hejmar	%	Hejmar	

						(%)	
Zimanê ku bi pêywendiyê Nexweşan re tê bikaranîn	Tirkî	106	77,4	59	42,1	165 (59,6)	,000
	Kurdî	3	2,2	28	20,0	31 (11,2)	
	Yên din**	28	20,4	53	37,9	81 (29,4)	
Serhev		137	100,0	140	100,0	277 (100,0)	

**131 Kurdî, 9 Kurdî+Tirkî+ Zazakî+Erebî, **75 Kurdî+Tirkî, 6 Tirkî+Kurdî+Erebî*

Tablo 8. Belavbûna bi gorî zimanê pêywendiyê ya ku bi nexweşan re bi zêdeyî tê bikaranîn de, dermansazên ku bûne babeta lêkolînê

	Hejmar	%
Tirkî	28	66,7
Kurdî	13	31,0
Bê bersîv	1	2,4
Serhev	42	100,0

Dema ku mirov pêywendiyên ziman bi nexweşan dinêre, diyar dibe ku ji bijişkan %59,6, ji dermansazan jî %66,7 bi tirkî, ji bijişkan %11, ji dermansazan jî %31 bi kurdî pêywendî digirin. Ji bijişkan %27,1 her çi qas di nav pirsan de tunebe jî gotine pêywendiyê xwe bi kurdî+tirkî digrin. Dema ku mirov bi gorû zimanê dayîkê ya bijişkan binêre, zimanê tê bikaranîn de cûdahî tê dîtin. Yên ku zimanê wan ê dayîkê tirkî ne bi piranî tirkî pêywendî datînin, yên ku zimanê dayîka wan kurdî ne bi tirkî+kurdî an jî kurdî pêywendî digrin ($p<0,05$).

Tablo 9. Bi gorî zimanên ku nexweşan di pêywendiyê de herî zêde bi bijişkên ku bûne babeta lêkolînê bikartînin

		Tirkî		Yên Din		Serhev		P
		Hejmar	%*	Hejmar	%*	Hejmar	%*	
Zimanê ku Nexweş Hewl Didin ku Pêywendî Bigrin	Tirkî	67	48,9	49	35,0	116	41,9	,001
	Kurdî	32	23,4	62	44,3	94	33,9	
	Yên Din**	38	27,7	59	20,7	67	24.1	

**Sedyekên sitûnan, **Yên Din (59): Tirkî+Kurdî, 9 Tirkî+Kurdî+Erebî*

Rewşa zimanê ku nexweş hewl didin bi bijişkan re pêywendî bigrin; bi gorî %41,9ê bijişkan tirkî, %33,9ê bijişkan kurdî, %24ê bijişkan jî kurdî, tirkî û zimanên din in. Heke mirov bi gorî zimanê dayîkê ya bijişkan çavlêbike, bi bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê ne tirkî ye nexweşên ku dixwazin zêdetir bi kurdî pêywendî digrin (%44,3) ji yên ku zimanê wan ê dayîkê tirkî ye bilindtir in (%23.4),($p<0,05$). Bi gorî dermansazan jî ji nexweşan %31,0 tirkî, %69.0 jî bi kurdî dixwazin pêywendî bigrin.

Tablo 10. Bi gorî pirsgirêkên ziman ya pêywendiyê ya bi nexweşan re belavbûna emir û zayenda bijişkên ku bûne babeta lêkolînê

	Her Dem + Bi Piranî	Carina	Pirsgirêk Najî	p
Koma Emir				
<30	10 (19,6)	27(52,9)	14(27,5)	
30-39	26 (17,1)	69(45,4)	57(37,5)	,153
40-49	13(20,6)	30(47,6)	20(31,7)	
50+	-	3(27,3)	8(72,7)	
Zayend				
Jin	17(28,8)	33(55,9)	9(15,3)	,000
Mêr	32(14,7)	96(44,0)	90(41,3)	
Zimanê Dayîkê				
Tirkî	29(21,2)	68(49,6)	40(29,2)	,059
Yên din	20(14,3)	61(43,6)	59(42,1)	
Salên Xebatê				
<5	11(21,2)	23(44,2)	18(34,6)	
5-9	13(17,3)	38(50,7)	24(32,0)	,952
10-14	14(18,2)	34(44,2)	29(37,7)	
15+	11(15,1)	34(46,6)	28(38,4)	
Serhev	49 (17,7)	129(46,6)	99(35,7)	

Têbinî: Sedyekan bi gorî serheviya sitûnan hatiye wergirtin.

Tablo 11. Bi gorî pirsgirêkên ziman ya pêywendiyê ya bi nexweşan re belavbûna emir û zayenda dermansazên ku bûne babeta lêkolînê

	Her Dem + Bi Piranî	Carina	Pirsgirêk Najî	p
Koma Emir				
<30	2 (11,8)	9 (52,9)	6 (35,3)	
30-39	5 (31,2)	8 (50,0)	3 (18,8)	
40-49	4 (44,4)	2 (22,2)	3 (33,3)	
Zayend				
Jin	4 (50,0)	4 (50,0)	-	0.08
Mêr	7 (20,6)	15 (44,1)	12 (35,3)	
Zimanê Dayîkê				
Tirkî	2 (22,2)	5 (55,6)	2 (22,2)	0.77
Kurdî	9 (27,3)	14 (42,4)	10 (29,4)	
Serhev	11(26,2)	19 (45.2)	12 (28.6)	

Têbinî: Sedyekan bi gorî serheviya sitûnan hatiye wergirtin.

Di lêkolînê di ji bijişk û dermansazan pêywendiya bi nexweşan re pirsgirêkên ziman dijîn an najîn jî, bijîn jî bi çi awayî dijîn hatiye pirsîn. Ji %17,7ê bijişkan, ji dermansazan jî %26,2 bersîva "her dem û piranî" dane. Ji bijişkan %46,6, ji dermansazan jî %45,2 bersîva "carina", ji bijişkan %35,7, ji bijişkan jî %28,6 jî bersîva "pirsgirêkek najîm" dane.

Di pirsgirêkên bingehziman ya di pêywendiyê de bi gorî emir, zayend û zimanê dayîkê jî, bijişkên jin bi gorî zilaman zêdetir pirsgirêkên ziman dijîn. Ev encama ji alî îstatîskî ve jî watedar e (p<,05). Ji alî komên emir, salên xebatê û zimanê zikmakî di pirsgirêkên pêywendiyê ku bingehziman e, cûdahiyekî îstatîstîkî naye dîtin (p>0,05). Di dermansazên jin de jî her çiqas di pêywendiyê de pirsgirêkên ziman ji ya zilaman zêdetir bin jî (%50,7 - %20,6) ev yeka ji alî "istatîskî ve ne watedar e (p>0,05).

Tablo 12. Bi gorî muqayesekirina zimanên dayîke ya bijişkên jin û mêr ku usa difikirin ku ji ber vê sedemê bi pêywendiyên xwe yên nexweşan re pirsgirêkan dijîn

Jin			Di pêywendiyê de jiyîna pirsgirêkên ziman			Serhev	p
			Her Dem + Piranî	Carina	Pirsgirêk Najî		
Mêr	Tirkî	Hejmar	15	22	5	42	,149
		%	35,7	52,4%	11,9%	100,0%	
	Yên din	Hejmar	2	11	4	17	
		%	11,8	64,7%	23,5%	100,0%	
	Tirkî	Hejmar	14	46	35	95	
		%	14,7%	48,4%	36,8%	100,0%	,463
	Yên Din	Hejmar	18	50	55	123	

Heke bijişkên zilam û jin bi hevre bi awayekî cûda werin nirxandin, tê dîtin ku bi gorî ku zimanê dayîka wan tirkî ye an na, di pêywendiyên pirsgirêkên bingehziman de ji alî îstatîstîkî ve tu cûdahî nehatine dîtin (p>0,05)

Tablo 13. Bi gorî pêywendiyê zimanên nexweşan ya ku herî zêde bikartînin de muqayesekirina pirsgirêkên ziman

		Di pêywendiyê de jiyîna pirsgirêkên ziman						Serhev		p
		Bi Piranî		Carina		Tune ye				
		Hejmar	%*	Hejmar	%*	Hejmar	% *	Hejmar	%**	
Zimanê ku	Tirkî	15	12,9	54	46,6	47	40,5	116	41,9	,111
Nexweş Hewl	Kurdî	35	21,7	75	46,6	51	31,7	161	58,1	
Didin ku										
Pêywendî										
Bigrin										

**Sedyeka Rêzê Berahî, ** Sedyeka Sitûnê*

Di pêywendiyê pirsgirêka ziman wê bi piranî kesên bi tirkî nizanibe re çêbe. Ev rewşa di xebata me de bi awayekî ne rasterast be jî bi riya pirsa "hûn bi nexweşên xwe re di pêywendiyê de kîjan zimanî bikartînin," hatiye lêpirsîn. Bi gorî %41.9ê bijişkan tirkî, %58.1ê wan jî zimanên ji bilî tirkî pêywendiyê bi riya ziman derdikeve pêş. Ji ber ku nexweşên ku pêywendiyê de zimanê tirkî bikarnaynin, pirsgirêk jî çêdibin. Jiyîna vê pirsgirêkê dema ku ziman ne tirkî be %21.7 e. Lê dema bi tirkî bixwazin pêywendî bigrin %12.9 e. Ev yeka ji alî îstatîstîkî ve ne bi wate ye (p>0,05).

Tablo 14. Bi gorî zimanên dayîkê ya bijişkên ku bûne babeta lêkolînê, muqayesekirina riyên pêywendiyê ya bi nexweşên ku bi tirkî nizanin

		Tirkî		Yên din*		Serhev		P
		Hejmar	%	Hejmar	%	Hejmar	%	
Hevdûfamkirina nexweşên ku bi tirkî nizanin	Nasên nexweş	51	37,2	20	14,3	71	25,6	,000
	Xebatkarên tenduristî	31	22,6	5	3,6	36	13,0	
	Bi zimanê nexweş	29	21,2	97	69,3	126	45,5	
	Yên din	26	19,0	18	12,9	44	15,9	

Tablo 15. Belavbûna riyên jihevfamkirinê ya bi nexweşan re ya bi dermansazên ku bûne babeta vê lêkolînê

	Hejmar	%
Bi riya nasên nexweş	2	4,8

Dîsa jî bi tirkî	1	2,4
Bi alîkariya şagirt	16	38,1
Bi riya zimanê ku nexweş diaxive	23	54,8
Serhev	42	100,0

Dema ku lêpirsîna bi nexweşên ku tirkî nizanin re pêywendî çawa tê girtin hate pirsîn, %45.5 bijişkan bersîva bi zimanê nexweşan, %25.6ê bijişkan bersîva bi alîkariya nasên wan û %13.0ê bijişkan jî bersîva bi alîkariya xebatkarên tendurîstî dane. Ji dermansazan jî %54.8 bersîva bi zimanê nexweşan û %38 jî bersîva bi alîkariya şagirtan dane.

Bi gorî zimanê dayîkê ya bijişkan riya pêywendiyê ya bi nexweşan re, bi awayekî watedar di formên îstatîstîkî de ji hev cûda dibin ($p<0,05$). Bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê ne tirkî ye, bi nexweşan re piranî bi zimanê nexweşan (%69,3) pêywendî digrin. Bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê tirkî ne jî bi riya nasên nexweşan %37,2, bi alîkariya xebatkarên tenduristî %22,6 û bi riya zimanê nexweşan jî %21,2 pêywendî bi nexweşan re digrin.

Tablo 16. Muqayesekirina bi gorî zimanê dayîkê ya bijişkên ku bûne babeta vê lêkolînê ku bi nexweşên tirkî nizanin û yên ku daxwaza axaftina zimanê dayîkê dikin û zimanê wan ê dayîkê jî ne tirkî ye

		Tirkî		Yên din*		Serhev		P
		Hejmar	%	Hejmar	%	Hejmar	%	
Nexweşên ku zimanê dayîka wan ne tirkî ye û dîsa jî bi tirkî biaxivin	Her dem	15	10,9	43	30,7	58	20,9	,000
	Piranî	47	34,3	62	44,3	109	39,4	
	Carina	51	37,2	27	19,3	78	28,2	
	Na	24	17,6	8	5,7	32	11,6	

Li gorî %60,3ê bijîşkan; piraniya nexweşên ku zimanê wan ê dayikê Tirkî ye , daxwaza wan a axaftina bi zımanê dayikê heb û. Ev rêje ku di bijîşkên Zimanê wan ê dayikê Tirkî ye de % 45,2 e, di bijîşkên ku zimanê wan ê dayikê Tirkî ye de % 75,0 hatiye dîtin, ev cudahî bi îstatîstîkî jî watedar e.

Tablo 17. Belavbûna pêywendiyên bi gorî zimanê dayîkê û bersîvên ku li hember pirsa didin ya bijişkên ku bûne babeta vê lêkolînê

		Tirkî		Yên din*		Serhev		P
		Hejmar	%	Hejmar	%	Hejmar	%	
Dema hûn ji nexweşên tirkî nizanin çîrokê wan dipirsin pirsgirêk dijîn?	Her dem	8	5,9	6	4,3	14	5,1	,091
	Piranî	28	20,6	27	19,3	55	19,9	
	Carina	79	58,1	68	48,6	147	53,1	
	Tu car	21	15,4	39	27,9	60	22,1	
Ji ber pirsgirêkên nezaniya ziman di nasîna nexweşiyê	Her dem	6	4,4	9	6,4	15	5,4	,161
	Piranî	27	19,7	28	20,0	55	19,9	

de astengî çêdibin?	Carina	78	56,9	63	45,0	141	50,9	
	Tu car	26	19,0	40	28,6	66	23,8	
Ji ber nezaniya ziman tetkîkên ji pêwîst zêdetir tên xwestin?(n:272, 5 Bê bersîv)	Her dem	1	0,7	3	2,2	4	1,4	,071
	Piranî	9	6,7	21	15,2	30	10,8	
	Carina	47	35,1	50	36,2	97	35,0	
	Tu car	77	57,5	64	46,4	141	50,9	
Carina hûn difikirin ku ji ber nezanîna ziman we nasîna nexweşiyê de xeletiyek kiribe?	Her dem	-	-	1	0,7	1	0,4	,913[a]
	Piranî	5	3,6	4	2,9	9	3,2	
	Carina	26	19,0	49	35,0	75	27,1	
	Tu car	98	71,5	84	60,0	182	65,7	
	Bêfikir e	8	5,8	2	1,4	10	3,6	
Carina hûn difikirin ku ji ber pirsgirêkên ziman nexweşên we di karanîna dermanan de tiştên we ji wan re pêşniyar kiriye baş famnekiribin?	Her dem	3	2,2	3	2,1	6	2,2	,331
	Piranî	23	16,8	30	21,4	53	19,1	
	Carina	62	45,3	68	48,6	130	46,9	
	Tu car	46	33,6	37	26,4	83	30,0	
	Bêfikir e	3	2,2	2	1,4	5	1,8	
Ji ber nezanîn an jî pirsgirêkên ziman, bi pêywendiyên we yên şêwrê ya bi nexweşan re dibe ku hûn hûn pirsgirêkan bijîn?	Her dem	2	1,5	2	1,4	4	1,4	,392
	Piranî	23	16,8	33	23,6	56	20,2	
	Carina	75	54,7	71	50,7	146	52,7	
	Tu car	34	24,8	33	23,6	67	24,2	
	Bêfikir e	3	2,2	1	0,7	4	1,4	
Nexweşên ku hûn bi zimanê wan nikarin biaxivin, agahiyên hûn didin heta çi radeyî famdikin?	Her dem	12	9,0	8	5,7	20	7,2	,006[a]
	Piranî	75	56,0	62	44,3	137	49,5	
	Carina	39	29,1	54	38,6	93	33,6	
	Tu car	1	0,7	11	7,9	12	4,3	
	Bêfikir e	7	5,2	5	3,6	15	1,4	
Dema agahiyên ku hûn didin naye famkirin nexweş heta çi radeyî pirsên xwe dubare dikin?	Her dem	20	14,6	22	15,7	42	15,2	,977
	Piranî	77	56,2	78	55,7	155	56,0	
	Carina	33	24,1	31	22,1	64	32,1	
	Tu car	5	3,6	7	5,0	12	4,3	
	Bêfikir e	2	1,5	2	1,4	4	1,4	
Ji ber cûdahiya ziman dibe hûn raya nexweşên xwe negrin?	Her dem	4	2,9	11	7,9	15	5,4	,074[a]
	Piranî	26	19,0	43	30,7	69	24,9	
	Carina	104	75,9	85	60,7	189	68,2	
	Tu car	3	2,2	1	0,7	4	1,4	
	Bêfikir e							

** 131 kes Kurdî, 9 kes jî ji yekî zêdetir ziman eşkere kiriye. **Bersîva ku Tirkî+Kurdî+Erebî dane. [a]Di testkirinê de rêzên berahî ya 1-2 û 3-4emîn hatin yekkirin û rêza berahî ya 5emîn cûda hat girtin.*

Tablo 18. Belavbûna hin ray û ramanên dermansazên ku bûne babeta vê lêkolînê ku di pêywendiyên nexweşan de pirsgirêkên bingehziman dijîn

	Her dem	Piranî	Carina, kêmcar	Na	Bê bersîv
Hûn bi pêywendiyên xwe yên nexweşan de pirsgirêkên ziman dijîn?	5	6	19 (45,2)	12	

	(11,9)	(14,3)		(28,6)	
Nexweşên ku zimanê dayîka wan ne tirkî ye daxwaza axaftina bi zimanê dayîkê dikin?	14 (33,3)	16 (38,1)	9 (21,4)	2 (4,8)	1 (2,4)
Dema hûn şiklên karanîna derman ji nexweşên xwe re behs dikin, ji ya pêwîst zêdetir dem wenda dikin?	1 (2,4)	14 (33,3)	20 (47,6)	7 (16,7)	
Hûn carina difikirin ku nexweşên we ji bo karanîna dermanan ji we famnekiribin?	-	5 (11,9)	26 (61,9)	10 (23,8)	1 (2,4)
Hûn carina difikirin ku nexweşên we dermanan çewt bikaranîbin?	-	1 (2,4)	19 (45,2)	17 (40,5)	5 (11,9)
Dema hûn şêwirmendî li nexweşên xwe dikin, hûn qet çewt tên famkirin?	1 (2,4)	9 (21,4)	21 (50,0)	11 (26,2)	-
Nexweşên ku hûn bi wan re heman zimanê neaxivin, ji we têdigihîjin?	6 (14,3)	14 (33,3)	18 (42,9)	1 (2,4)	3 (7,1)
Dema ku agahiyên hûn didin nexweşan neye famkirin nexweşên we pirsan dubare ji we dipirsin?	21 (50,0)	15 (35,7)	5 (11,9)	-	1 (2,4)
Nexweşên we bêyî ku biçin bijişk tên serî li we didin û daxwaza dermankirinê ji we dikin?	4 (9,5)	15 (35,7)	16 (38,1)	5 (11,9)	2 (4,8)
Bêyî ku nexweşên we werin derman ji we bigrin, nasên xwe dişînin ji we re?	1 (2,4)	15 (35,7)	17 (40,5)	5 (11,9)	4 (9,5)

Dema peyvên bijişkan ya li hemberî pirsgirêkên bingehziman û pêywendiyê hatin berhevdan; ji bo sedema “pirsgirêkên bingehziman ya pêywendiyê” bijişkan bi zêdeyî (her dem+bi piranî) ango %25.0 dema hewisîna çîrokên nexweşan de pirsgirêkan re rûberû dibin. Her weha %25,3 di dema nasîna nexweşiyê de, %12,2 ji ya pêwîst zêdetir di tektîk xwestinê de, %3,6 di şikdariya nasîna çewt de, %21,3 di famnekirina ray û pêşniyarên nexweşan de, %21,6 jî di şêwra nexweşiyan de pirsgirêkan dijîn.

Bi gorî %71,2yê bijişkan, nexweşên wan ji wan pirsan dikin; ji bijişkan %5,4an jî ji ber cûdahiya ziman ji wergirtina raya nexweşan direvin. Bi gorî cûdahiya zimanê zikmakî ya bijişkan ku çi tirkî û çi jî ne tirkî ye, di navbera bersîvan de ji alî îstatîskê ve çi cûdahî nehatiye dîtin ($p>0,05$).

Bi gorî %56,7ê bijişkan, bi nexweşên xwe re heman zimanê neaxivin jî nexweşên wan piraniya afahiyên ew didin famdikin. Ev rewşa li bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê tirkî ne, wekî %65,0 e; di bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê ne tirkî ne de jî ev rêje %50 ye ku ev ji alî îstatîstîkî ve jî watedar e ($p<0,05$).

Bi gorî cûdahiya zimanên zikmakî raya wernegirtina nexweşan de, belavbûnên îstatîstîkî bi awayekî watedar naguhere ($p>0,05$), %5,4ê bijişkan bi piranî, %24,9ê wan carina ji wergirtina raya nexweşan vedikşên. Ji bijişkên ku zimanê wan ê zikmakî tirkî ne %19,0, ji yên din jî %30,7 carina ji ber cûdahiya ziman ji wergirtina raşan vekşiyane.

Ji %3,6ê bijişkan ji ber pirsgirêkên bingehziman ku di pêywendiyê de astengî derdixin, fikir dikin ku di nasîna nexweşiyê de çewtî kirine. Yên ku difikirin carina di nasîna nexweşiyê de çewtî kirine di nav bijöişkên ku zimanê wan ê dayîkê tirkî ne de %22,6 e. Lê ev rêje di nav bijişkên zimanê wan ê dayîkê her çi qas zêde derketibe jî (%38,6) ji alî îstatîstîkî ve tu cûdahiyek watedar nehatiye dîtin ($p>0,05$)

Di pêywendiya ji bir pirsgirêkên ziman de %33,7ê dermansazan fikir dikin ku ji bo karanîna dermanan bi nexweşan re zêdeyî (her dem+bi piranî) wext derbas dikin da ku bi wan bidin famkirin. Ji vana %11,9 fikir dikin ku nexweş ji dermankirinê famnekirine, %23,8 fikir dikin ku di dema şêwrê de pirsgirêk dijîn, %47,6 jî her çi qas bi nexweşan re heman zimanê jî neaxivin fikir dikin ku nexweş ji wan famkirine. Bi gorî %71,4ê dermansazan nexweşên ku zimanê wan ê dayîkê ne tirkî ne daxwaza axaftina bi zimanê dayîkê dikin. %85,7 jî dibêjin ku nexweş dikarin ji wan pirsan bikin. Bi gorî %45,2ê dermansazan nexweş bêyî ku biçin bijişkê serî li wan didin, bi gorî %38,1ê dermansazan jî nexweş ji bo derman girtinê bi nasên xwe re tên dermanxaneyê.

Tablo 19. Belavbûna bersîvên bijişkên ku li hember pirsê "Dema ku nexweş famdike ku hûn zimanê dayîkê yê/ya wî/wê dizanin li hember we çi helwest digre."

		Tirkî		Yên din		Serhev		p
		Hejmar	%	Hejmar	%	Hejmar	%	
Heke hûn zimanê dayîkê nexweşan dizanin dema nexweş vê fam bike baweriya wî/ê	Zêde	70	51,1	111	79,3	181	65,3	,000
	dibe	50	36,5	17	12,1	67	24,2	
	Naguhere	17	12,4	12	8,5	29	10,4	
	Yên din*							

**Bi raya min baweriya wî/ê kêm dibe 13, Bê bersîv 5, yên din jî 11 kes vê bersîvê dane.*

Tablo 20. Belavbûna bersîvên dermansazên ku li hember pirsê "Dema ku nexweş famdike ku hûn zimanê dayîkê yê/ya wî/wê dizanin li hember we çi helwest digre."

	Hejmar	%
Hîsdikim ku baweriya wi/wê zêde dibe	30	71,4
Baweriya wi/wê naguhere	8	19,0
Hîsdikim ku baweriya wi/wê kêm dibe	2	4,8
Yên din	1	2,4
Bê bersîv	1	2,4
Serhev	42	100,0

%65,3ê ji bijişkên ku bûne babeta vê lêkolînê difikirin ku dema nexweş pê zane ku bijişk jî zimanê wan zane, baweriya wan lê zêde dibe. Ev yeka di nav bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê tirkî ye %51,1 e, di nav bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê ne tirkî ye jî %79,3 ye ($p<0,05$). Bi gorî %71,4ê dermansazan jî baweriya nexweşan zêde dibe.

Tablo 21. Bi gorî bijişkên ku bûne bebate vê lêkolînê li Diyarbekir di pêywendiyên nexweş û bijişkan de pirsgirêkên ziman

		Tirkî		Yên din		Serhev		P
		Hejmar	%	Hejmar	%	Hejmar	%	
Bi raya we li Diyarbekir pêywendiya nexweş û bijişkan de pirsgirêkên ziman di çi astê de ye?	Pir zêde	9	6,6	28	20,0	37	13,4	,000
	Zêde	38	27,7	59	42,1	97	35,0	
	Pir hindik	79	57,7	45	32,1	124	44,7	
	Qet tune ye	6	4,4	2	1,4	8	2,9	
	Bêfikir	5	3,6	6	4,3	11	4,0	

Tablo 22. Bi gorî dermansazên ku bûne bebate vê lêkolînê li Diyarbekir di pêywendiyên nexweş û dermansazan de pirsgirêkên ziman.

	Hejmar	%
Pir zêde	3	7,1
Zêde	16	38,1
Pir hindik	16	38,1
Qet tune ye	4	9,5
Bêfikir / Bê bersîv	3	7,1
Serhev	42	100,0

Bi gorî %48,4ê bijişkan, %45,2ê dermansazan li Diyarbekir pêywendiya nexweş û bijişkan de pirsgirêka ziman heye. Bi gorî %44,7ê bijişkan, %38,1ê jî dermansazan ev pirsgirêk di astekî gelek kêm de ye. %34,3ê bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê tirkî ye belavbûna pirsê berfireh dibînin, her weha ji %62,1ê bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê ne tirkî ye jî ev pirsa berfireh dibînin. Ev cûdahî ji alî îstatîstîkê ve jî watedar e (p>0,05).

Tablo 23. Bi gorî zimanê dayîkê yên bijişkên jin û mêr, li Diyarbekir muqayesekirina pirsgirêkên ziman ya di pêywendiyên nexweş û bijişkan de têne dîtin.

Bi raya we li Diyarbekir pêywendiya nexweş û bijişkan de pirsgirêkên ziman di çi astê de ye?		Tirkî		Yên din		Serhev		P (p)
		Hejmar	%	Hejmar	%	Hejmar	%	
Jin	Pir zêde	4	9,5	4	23,5	8	13,6	,342 (,408)
	Zêde	15	35,7	5	29,4	20	33,9	
	Pir hindik	21	50,0	6	35,3	27	45,8	
	Qet tune ye	0	-	0	-	0	-	
	Bêfikir	2	4,8	2	11,8	4	6,8	
Mêr	Pir zêde	5	5,3	24	19,5	29	13,3	,000 (,000)
	Zêde	23	24,2	54	43,9	77	35,3	
	Pir hindik	58	61,1	39	31,7	97	44,5	

	Qet tune ye	6	6,3	2	1,6	8	3,7	
	Bêfikir	3	3,2	4	3,3	7	3,2	

(p): Di testkirinê de rêzên berahî ya 1-2 û 3-4emîn hatin yekkirin û rêza berahî ya 5emîn cûda hat girtin.

Dema bi gorî zimanên zikmakî ya bijişkan cûda were çavlêkirin tê dîtin ku bi gorî zimanê zikmakî ya bijişkên jin pirsgirêkên bingehziman ya pêywendiyê ji alî îstatîstîkî ve pir cûda nîne (p>0,05). Lê di nav bijişkên mêr de ev rewş diguhere (p<0,05). %45,2ê bijişkên jin ku zimanê wan ê zikmakî tirkî ye difikirin ku li Diyarbekir pirsgirêkên bingehziman ya di pêywendiyê de zêde ye. Ev rêje di nav bijişkên ku zimanê wan ê zikmakî ne tirkî ye de, %52,9 e. Di nav bijişkên mêr de ev rêje bi gorî rêzên pirsê %29,5 û %63,4 derketiye. *Bi gorî van nirxan mirov dikare bêje ku li Diyarbekir di pêywendiya nexweş û bijişkan de cûdahiya pirsgirêkên bingehziman zêdetir ji bijişkên mêr û yên ku zimanê wan ê zikmakî ne tirkî ye derdikevin holê...*

Tablo 24. Bi gorî zimanê dayîkê ya bijişkan hûrnêrîna komên ku pirsgirêkên pêywendiyê ya herî zêde tên dîtin.

		Tirkî		Yên din		Serhev		P
		Hejmar	%	Hejmar	%	Hejmar	%	
Hûn herî pir bi nexweşên jin an jî bi yên mêr re pirsgirêk dijîn?	Bi mêran re	6	4,4	1	0,7	7	2,5	,146
	Bi jinan re	86	63,2	97	69,3	183	66,1	
	Cûdahî tune ye	25	18,4	19	13,6	44	15,9	
	Pirsgirêkên min tune ne	19	14,0	23	16,4	42	15,2	
Bi gorî hatina ciyê wan hûn herî pir bi kîjan nexweşan re pirsgirêk dijîn?	Ji navenda bajêr	1	0,7	1	0,7	2	0,7	,206
	Ji gund û navçeyan							
	Ji bajarên din	102	74,5	86	61,9	188	67,9	
	Cûdahî tune ye	3	2,2	8	5,8	11	4,0	
	Pirsgirêk tune ye	12	8,8	18	12,9	30	10,8	
		19	13,9	26	18,7	45	16,2	
Bi gorî emrê wan hûn herî pir bi kîjan nexweşan re pirsgirêk	>50	97	70,8	88	63,3	185	66,8	,721
	24-50	7	5,1	10	7,2	17	6,1	
	<24	1	0,7	2	1,4	3	1,1	
	Cûdahî tune ye	11	8,0	12	8,6	23	8,3	
	Pirsgirêk tune ye	21	15,3	27	19,4	48	17,3	

dijîn?								
Di kîjan saziyên tenduristî de pirsgirêkên bingehziman ya di pêywêndiyê de derdikevin holê zêde ne?	Pêla yekemîn	27	20,0	18	13,0	45	16,2	,030
	Nexweşxaneyên dewletî	20	14,8	35	25,4	55	19,9	
	Nexweşxaneyên taybetî	5	3,7	6	4,3	11	4,0	
	Cûdahî tune ye	53	39,3	62	44,9	115	41,5	
	Pirsgirêk tune ye	7	5,2	1	0,7	8	2,9	
	Bêfikir im	23	17,0	16	11,6	43	14,4	

Tablo 25. Belavbûna bersîvên dermansezên ku di pêywendiyê de bi gorî emir, zayend û ciyên ku jê hatine pirsgirêkên herî zêde tên dîtin.

		Hejmar	%
Hûn herî pir bi nexweşên jin an jî bi yên mêr re pirsgirêk dijîn?	Herî zêde bi mêran re	-	-
	Herî zêde bi jinan re	30	71,4
	Tu cûdahiyek mezin tune ye	5	11,9
	Pirsgirêkên pêywendiyê najîm	7	16,7
Bi gorî hatina ciyê wan hûn herî pir bi kîjan nexweşan re pirsgirêk dijîn?	Ji navenda bajêr	1	2,4
	Ji gund û navçeyan	28	66,7
	Ji bajarên din	2	4,8
	Cûdahî tune ye	2	4,8
	Pirsgirêk tune ye	9	21,4
Bi gorî emrê wan hûn herî pir bi kîjan nexweşan re pirsgirêk dijîn?	>50	24	57,1
	24 – 50	6	14,3

	<24	5	11,9
	Cûdahî tune ye	7	16,7

Bi gorî yên ku beşdarî anketê bûne %66,1ê bijişkan bi jinan re, %67,9ê wan bi yên ku ji navçe û gundan hatine, %66,8ê wan jî yên emrê wan li ser 50 ne pirsgirêkan dijîn.Bi gorî zimanê zikmakî ya bijişkan komên ku pirsgirêkên bingeh ziman ya di pêywendiyê de dijîn cûda ye (p>0,05). Bi gorî yên ku beşdarî anketê bûne %71,4ê dermansazan bi jinan re, %66,7ê wan bi kesên ku ji navçe û gundan hatin re, %57,1ê wan jî bi kesên emrê wan li ser 50 ne pirsgirêkan dijîn.

Tablo 26. Bi gorî zimanê dayîkê ya bijişkan belavbûna hin nêrînên wan.

		Tirkî		Yên din		Serhev		p
		Hejmar	%	Hejmar	%	Hejmar	%	
Hûn beşdarî raya “Bijişk heke zimanê li ciyê ku kar dike bizanibe wê wergirtina xizmetên tenduristi û çalakbûna wê baştir bibe,” dibin an na?	Yeqîn	71	52,2	123	87,9	194	70,0	,000
	Dibe ku	47	34,6	12	8,6	59	21,3	
	Yên din	18	13,2	5	3,6	23	8.3	
Rewşa memnuniyetê ya ji karkirina Diyarbekir	Pir memnûn e	50	36,5	71	50,7	121	43,7	,060
	Bi piranî memnûn e	62	45,3	48	34,3	110	39,7	
	Memnûn nîne	19	13,9	13	9,3	32	11,6	
	Qet nîne	1	0,7	4	2,9	5	1,8	
	Yên din	5	3,6	4	2,9	9	3,2	
Rewşa beşdarbûna ya li	Yeqîn	43	31,4	94	67,6	137	49,5	,000

raya "Li ciyên ku kardikim bi nexweşan re bikaribim zimanê wan biaxivim, ji bo min gelek girîng e"	Dibe ku	48	35,0	33	23,7	81	29,2
	Beşdar nabe	32	23,4	9	6,5	41	14,8
	Qet eşdar nabe	12	8,8	2	1,4	14	5,1
	Bê bersîv	2	1,5	1	0,7	4	1,5

Tablo 27. Nêrînên dermansazên ku bûne babeta vê lêkolînê yên li ser zanîna ziman, rewşa memnuniyeta karkirina ji Diyarbekir û karkirina li ciyê ku bi nexweşan re dikarin bi heman zimanê re pêywendî bigrin.

		Hejmar	%
"Dermansaz heke zimanê li ciyê ku kar dike bizanibe wê wergirtina xizmetên tenduristi û çalakbûna wê baştir bibe."	Yeqîn beşdar dibim	30	71,4
	Kêmek beşdar dibim	9	21,4
	Beşdar nabim	-	-
	Qet beşdar nabim	1	2,4
	Bêfikir im / Bê bersîv im	2	5,8
"Li ciyên ku kardikim bi nexweşan re bikaribim zimanê wan biaxivim, ji bo min gelek girîng e"	Yeqîn beşdar dibim	26	61,9
	Kêmek beşdar dibim	9	21,4
	Beşdar nabim	3	7,1
	Qet beşdar nabim	2	4,8
	Bêfikir im / Bê bersîv im	2	4,8
Hûn ji karkirina ji Diyarbekir memnûn in an na?	Pir memnûn im	15	35,7
	Bi piranî memnûn im	22	52,4
	Memnûn nînim	4	9,5
	Qet memnûn nînim	-	-
	Bêfikir im / Bê bersîv im	1	2,4

Bi gorî %70,0ê bijişkên li Diyarbekir, li ciyên kar zanîna zimanê herî zêde tê axaftin ya nişteciyan wergirtina xizmet û çalakbûna tenduristiyê pêşve dibe. Bi gorî yên ku zimanê wan ê dayîkê tirkî ye ev rêje %52,2 e. Lê bi gorî bijişkên ku zimanê wan ê zikmakî ne tirkî ye ev rêje derdikeve %87,9an ($p<0,05$). Ji dermansazan %71,4 bi awayekî yeqîn beşdarî vê dîtînê bûne. %83,4ê bijişkan, %88,1ê dermansazan bi awayekî berfireh ji jiyana Diyarbekir memnûn in. Bi gorî çavlêkirina zimanê dayîkê ya bijişkan cûdahiyekî watedar nehatiye dîtin ($p>0,05$). Ji bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê tirkî ne %31,4, ji yên ku zimanê wan ê zikmakî

ne tirkî ne jî %67,6, beşdarî raya “li ciyên kar bi nexweşan re peyîvîna heman zimanê girîng e” dibin. Ev cûdahî ji alî îstatîstîkî ve jî watedar e ($p<0,05$). Ji dermansazan jî %61,9 beşdarî vê dîtînê dibin.

Tablo 28. Belavbûna pirsgirêkên dermansaz û bijişkên ku bûna babeta vê lêkolînê ku dema karên xwe dikin rûberû dibin.

		Bijişk		Dermansaz	
		Hejmar	%	Hejmar	%
1	Têrbûna aborî	174	62,8	35	83,3
2	Pirsgirêkên halet û avahiya bingehîn	217	78,3	22	52,4
3	Pirsgirêkên emnahiyê yên li nexweşxane tên jiyîn	95	34,3	-	-
4	Pirsgirêkên pêywendiyê yên bingehziman	103	37,2	23	54,8
5	Pirsgirêkên burokratîk û yên bingehmevzûat	174	62,8	31	73,8

Ji bijişk û dermansazan pirsgirêkên herî girîng yên ku dema karên xwe dikin rûberû dibin, hatiye pirsîn. Dema encam ji çav hatin derbaskirin hate dîtin ku %78,3ê bijişkan pirsgirêkên halet û avahiya bingehîn, %62,8ê wan pirsgirêkên burokratîk yên bingehmevzûat û têrbûna aborî, wekî sedemên herî girîng nîşan dane. Bi gorî %83,3ê dermansazan jî pirsgirêka têrbûna aborî, bi gorî %73,8ê wan jî pirsgirêkên burokratîk yên bingehmevzûat pirsgirêkên herî girîng in. Ji dermansazan %54,8, ji bijişkan jî %37,, dibêjin bi pirsgirêkên bingehziman yên pêywendiyê ve rûberû bûne.

Tablo 29. Pêşniyarên dermansaz û bijişkên ku bûne babeta vê lêkolînê yê li ser li Diyarbekir pêywendiya nexweş û bijişkan de pirsgirêkên ziman.

		Bijişk		Dermansaz	
		Hejmar	%	Hejmar	%
1	Li bajarê me di pêywendiyên bijişk û nexweşan de pirsgirêka ziman tune ye	10	3,6	4	9,5
2	Divê xebatkarên tenduristî yên zimanê zikmakî ya herêmê dizanin werin şoxilandin	111	40,0	27	64,3

3	Divê bijişk zimanê herî zêde tê axaftin fêr bibin	120	43,3	-	-
4	Yên din	13	5,0	3	7,2
5	Tu pêşniyarê min tune ye	32	11,6	8	9,0

Bijişk, di pêywendiya bijişk û nexweşan de ji bo pirsgirêkên bingehziman neyên jiyîn bi %43,3 "fêrbûna zimanê herî zêde tê axaftin" û %40,0ên wan jî "dDivê xebatkarên tenduristî yên zimanê zikmakî ya herêmê dizanin werin şoxilandin" pêşniyar kirine. Dermansaz jî bi rêjeya %64,3 "divê xebatkarên tenduristî yên zimanê zikmakî ya herêmê dizanin werin şoxilandin" pêşniyar kirine.

Tablo 30. Bi gorî bijişkan pirsgirêkên girîng yên Diyarbekir.

		Bijişk		Dermansaz	
		Hejmar*	%	Hejmar	%
1	Emnahî	142	51,3	17	40,5
2	Sosyoaborî	201	72,6	30	71,4
3	Pirsgirêkên bajarvanî	153	55,2	22	52,4
4	Pirsgirêkên tenduristî	116	41,9	22	52,4
5	Pirsgirêka kurd	183	66,1	35	83,3
6	Bêkarî	206	74,4	36	85,7
7	Kêmaniyên jiyana civakî	121	43,7	24	57,1

** 54 kesan hemû xalan hilbijartine.*

Ji bijişk û dermansazên ku bûna babeta lêkolînê, bi gorî wan pirsgirêka herî mezin ya Diyarbekir çi ye jî hatiye pirsîn. %74,4ê bijişkan, %85,7ê jî dermansazan bêkarî wekî pirsgirêka mezin dîtine.

GENGEŞÎ

Zimanê zikmakî yên bijişkên ku li Diyarbekir kar dikin (yên ku bûne babeta lêkolînê) nêzî nîvê wan bi tirkî, nîvê din jî ji bilî tirkî bi piranî kurdî xwedî zimanên cûda ne. Ji vana %76,5 ji kurdî famdikin. Ev rewş di pêywendiyên nexweşan de jî xwe eşkere dike. Di pêywendiya bijişk û nexweşan de zimanê pêywendiyê nêzî %60 tirkî ye. Bijişkên ku zimanê wan ê zikmakî ne tirkî ye % 42,1 bi tirkî, %37,9 tirkî+kurdî pêywendî digrin. Ji alî din bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê tirkî ne %22,6ê wan bi nexweşên xwe re ji bilî tirkî, piranî jî bi kurdî pêywendî digrin. Her çi qas cûdahiya zimanên zikmakî hebe jî, ji ber ku herkes bi tirkî dizane ev rewş derdikeve holê. Lê di pêywendiyê de kurdî jî bi awayekî berfireh tê

bikaranîn. Ji bo ku nexweşên bi tirkî nizanin re pêywendî bigrin, bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê tirkî ne jî ferî kurdî bûne.

Bi gorî raya bijişkan nexweşên ku bi gorî zimanê zikmakî ya bijişkan pêywendî li gel wan digrin cûdahî nîşan didin. Bi gorî bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê tirkî ne, nîvê nexweşan bi tirkî, ¼ê wan bi kurdî, ¼ê wan jî ji yekî zêdetir bi zimanan pêywendî digrin. Bi gorî raya bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê kurdî ne jî; %35ê nexweşan bi tirkî, %44,3yê nexweşan bi kurdî, %20,7ê nexweşan jî ji yekî zêdetir zimanan ve pêywendî digrin. Ev cûdahiya pêywendiya ziman ya bi gorî zimanên dayîkê ya bijişkan, xwezayiye ku ji ji wekheviya zimanên zikmakî derketibe holê. Lê bi gorî bijişkên ku zimanê dayîka wan tirkî ye ku dibêjin nîvê nexweşan pêywendiyên xwe bi kurdî dixwazin pêkbînin, girîng e.

Dema daneyên tablo 4 û 5 were nirxandin tê dîtin ku tirkî û kurdî bi awayekî berfireh tê bikaranîn; her weha karanîna her dû ziman bi hev re jî gelek berfireh e. Di pêywendiya nexweş û bijişkan de, bi awayekî xwezayî tê dîtin ku zêdetir "zimanê hevbeş" tê tercîhkirin. Ji ber ku li herêmê zimanên cûda tên bikaranîn, di navbera demê de yên zimanê wan ê dayîkê kurdî ne tirkî, yên zimanê wan ê dayîkê tirkî ne jî kurdî fêrbûne. Ji ber vê sedemê pêywendiya "tirkî+kurdî", ango pêywendiya karanîna bi her dû zimanan bi awayekî berfireh tê dîtin.

Jiyîna pirsgirêkên carina û bi kêmayî be jî, her dem tên dîtin. Ji ber vê yekê mirov dikare bersîvên "her dem û bi piranî" wekî hebûna pirsgirêkên pêywendiyên ziman binirxîne. %17,7ê bijişkan, 26,2ê dermansazan "her dem û bi piranî" pirsgirêkên ziman bi nexweşan re dijîn. Di pêywendiyê de faktorekî berbiçav ya karanîna ziman, bi zayenda bijişkê ve girêdayî derdikeve holê. Bijişkên jin, ji bijişkên mêr dû qat zêdetir pirsgirêkên ziman dijîn. Sedema vê yekê dibe ku piraniya zimanê zikmakî ya bijişkên jin tirkî ne, ji ben wê be. Zimanê zikmakî yên bijişkên mêr %43,6, yên bijişkên jin jî %71,2 tirkî ne. Bijişkên jin û mêr dema ji hev cûda tên nirxandin, tê dîtin ku bi gorî zimanê wan ê dayîkê rewşa pirsgirêkên bingehziman jî diguhere. Dema mirov lê binêre difikire ku bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê tirkî ne ew ê zêdetir pirsgirêkên ziman bijîn. Lê ji ber ku tû cudahî naye dîtin, mirov wê gavê dikare fikra pêywendiya riyên din bîne bîra xwe. Piraniya nexweşan dixwazin bi tirkî an jî zimanên ji bilî tirkî pêywendî bigrin. Li hember vê yekê dîsa jî di navbera zimanan de tu cûdahî nayên dîtin. Ev jî bi me nîşan dide ku pirsgirêkên bi vî rengî di hemû zimanan de dibe ku werin tespîtkirin.

Bi gorî zimanê dayîkê ya bijişkan riyên ji hevûdû famkirina bi nexweşan re jî cûdahî tên dîtin. Bi serhev %45,5 bi nexweşên ku tirkî nizanin re bi zimanê wan ê dayîkê pêywendî tên girtin. Lê ev rêjeya di nav bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê tirkî ye dibe %21,2, di nav bijişkên ku zimanê dayîkê wan ne tirkî ye jî dibe %69,3. Bi nexweşên ku tirkî nizanin re yek ji riyên herî zêde tê bikaranîn jî (%25,6) alîkariya nasên nexweşan e. Ev rêjeya li bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê tirkî ne dibe %37,5; li bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê ne tirkî ye jî dadikeve %14,3an. Bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê tirkî ne %22,6 bi alîkariya xebatkarên tenduristî bi nexweşên xwe re pêywendî digrin. Lê bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê ne tirkî ne –ji ber ku ew bi xwe dikarin zimanê nexweş biaxivin- ji xebatkarên tenduristiyê kêm (%3,6) alîkarî werdigrin. Nexweşên ku bi tirkî nizanin, heke bijişk bi zimanê wan bi wan re pêywendî bigre, bi awayekî xwezayî ew jî derdê xwe bi wê zimanê dibêje. 1/5ê bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê kurdî ye bi nexweşên xwe yên tirkî nizanin re bi zimanê wan pêywendî digre. Ev jî nîşan dide ku hin bijişk zimanê nexweşên xwe fêrbûne. *Heke bijişkên jin û mêr ji hev cûda werin nirxandin tê dîtin ku bi gorî zimanê wan ê dayîkê pêywendiyên wan ên bi nexweşan cûdayî çêdibin. Di nav bijişkên mêr de pêywendiya bi nexweşan %51,6 bi zimanê nexweşan ve tê danîn. Lê ev rêje di bijişkên jin de dadikeve %22,0an. Ev yeka dibe ku ji zimanê dayîkê ya bijişkên mêr derkeve holê, ji ber ku di nav bijişkên mêr de yên zimanê wan ê*

dayîkê ne kurdî ne zêdetir in. Her weha tê dîtin ku bijişkên jin ku zimanê wan ê dayîkê kurdî ne bi nexweşên tirkî nizanin re bi rêjeyekî zêdetir pêywendî bi zimanê nexweşan digrin. Ev jî bingeha vê raya hanê qaîmtir dike...

Bi gorî 60,3yê bijişkan nexweşên ku zimanê wan ê dayîkê ne tirkî ne, bi piranî daxwaza axaftina bi zimanê dikin. Ev rêje bi gorî bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê ne tirkî ne %75,0, bi gorî bijişkên zimanê wan ê dayîkê tirkî ne jî %45,2 ye. Tiştekî xwezayî ye ku nexweşên ku zimanê wan ê dayîkê ne tirkî ne, dixwazin bi zimanê xwe pêywendî bigrin.

Di vê xebatê de bi piranî pirsgirêkên pêywendiyê ya bingehziman bi gorî zimanê zikmakî ya bijişkan hatiye lêkolîn.

Di babetên wekî hewisîna çîrokên nexweşan, astengiya nasînên di nexweşiyê de, tetkîk xwestina zêdetir, nasîna nexweşiyê ya çewt, famkirina pêşniyarên dermankirinê, nexweş bikaribin pirsên xwe bi hêsanî bikin, şêwirmendî de, di nav bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê tirkî ne û ne tirkî ne, cûdayiyek zêde nehatiye dîtin. Mirov dikare bêje ku zimanê bijişkan çi tirkî û çi jî ne tirkî, tu bandorek li pêkhatinên wan (nasîna rast ya nexweşiyê, sazkirina riya herî baş ya dermankirinê, agadarkirina nexweşan ûhwd.) ên pîşeyî nekiriye. Çareserkirina ev rewşa hanê ku ji nezaniya ziman derdikeve holê, tê dîtin ku bi hin riyên din, ango riyên wekî fêrbûna zimanê nexweş, alîkarî wergirtina ji nasên nexweş û alîkarî wergirtina ji xebatkarên tenduristiyê tê tarîfkirin.

Heke nexweş û bijişk bi yek zimanî neaxivin, dibe ku her daîm pirsgirêkên pêywendiyê di navbera wan de derkeve û agahiyên pêwîst nikaribin werbigrin. Di vî warî de, ango bijişkên ku bi nexweşan re bi heman zimanê ve nikarin biaxivin de, rayên bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê tirkî ne û yên ne tirkî ne ji hev cûda ne. Bi gorî %65,0ê bijişkên ku zimanê dayîka wan tirkî ye, bi nexweşan re heman zimanê neaxivin jî nexweş ji wan famdikin. Lê ev rêje di nav bijişkên ku zimanê dayîka wan ne tirkî ye, dadikeve %50.0an. Bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê ne tirkî ye hemû her weha bi tirkî jî zanin. Dibe ku ji ber vê yekê bijişkên bi vî tehrî bsi vê pirsê re zêdetir rûberû nebûne. Sedemekî din ya vê pirsgirêkê dibe ku bi riya navberciyan dayîna agahiyan be jî. *Heta dibe ku bijişk vê pirsê bi awayekî farazî bersîvandibin. Lê dîsa jî nexweş û bijişk bi heman zimanî nikaribin biaxivin, di dayîna agahiyan de kêmasî divê her dem were hesibandin.*

Di navbera kesên ku heman zimanî dikarin biaxivin de, dibe ku hestên baweriyê zêdetir were dîtin. Lê di vê xebatê de dema ji bijişkan ev yeka hatiye pirsîn bersîvên ji hev cûda derketine holê. Di pirs de zimanê zikmakî ya nexweş nehatiye eşkerekirin. Bijişk bi gorî zimanê xwe yê dayîkê dibe ku bersîvên cûda dabin. Her weha yên ku zimanê wan ê dayîkê ne tirkî ne zêdetir bi hestiyar tevgeriyabin û yên zimanê wan ê dayîkê tirkî ne jî, bi awayekî bêhestiyar bersîvan dabin...

Bi gorî bijişkên jin yên ku zimanê wan ê dayîkê tirkî ye û ne tirkî ye, her çi qas bi nexweşan re heman zimanê neaxivin jî rêjeya agahiyên didin nexweşan pir cûda nîne. Lê bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê ne tirkî ne ji yên zimanê wan ê dayîkê tirkî ne zêdetir bal dikşînin ku ew nayên famkirin. *Ev yeka dibe ku ji baldariya bijişkên mêr ya li hember pirsa ziman jî derkeve holê.*

Dema ku kesên ku bizanibin bi heman zimanê diaxivin, ango zimanê wan ê dayîkê wekî hev in, wê hestên baweriya wan zêdetir derkeve pêş. Di xebatê de ji ber ku "kîjian zimanê dayîkê" ye nehatiye eşkerekirin, divê ji alî hemû zimanên li herêmê tên karanîn hatibe

bersîvandin. Hin bijişk jî dibe ku bi gorî wekhevbûna zimanê xwe yê dayîkê û ya nexweş, bersîv dabe. Bijişkên ku bi gorî zimanê xwe yê dayîkê bersîv dane, dibe ku ji hestiyariya bijişkên mêr jî derketibe holê...

Pirsgirêka ziman ya li Diyarbekir ku navbera nexweş û bijişkan de tê jiyîn, bi awayekî din, ango bi hin pirsên liberhevkirinê jî ji bijişkên ku bûne babeta vê lêkolînê jî hatiye pirsîn.%48,4ê bijişkan bersîva xwe de li Diyarbekir pir zêde û zêde pirsgirêka ziman heye, dane. Ev rêjeya ji alî bijişkên ku zimanê wan ê zikmakî ne tirkî negêhiştiye %62,1an. Ev rêje ji koma din (34,3) bi awayekî watedar zêde ye. Ev reqamên han dema bersîvên bijişkên ku ji bo pirsa "hûn bi nexweşên xwe re pirsgirêkên ziman dijîn," re were berhevkirin, hin nakokî têne dîtin. Bijişk bi xwe dibêjin "bi awayekî kêm" em bi vê pirsê re rûberû dibin. Lê bal dikşînin ku li Diyarbekir ev pirsa bi zêdeyî tê dîtin û pirsgirêk mezin e. Ji bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê tirkî ne, tenê %14,3 gotine bi pêywendiyê nexweşên xwe re pirsgirêkên ziman dijîn. Lê ji bo pirsa li Diyarbekir ev pirsgirêk çi qas bi bandor e jî, bi rêjeya %62,1 bersîva "pir zêde û zêde" dane. Di nav bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê tirkî ne jî, rêza rêjeyan wekî %21,2 û 34,3 derketiye holê. Dibe ku bijişk bi xwe vê pirsgirêkê re rûberû nebe jî difikire ku hevpîşeyê/a wê/î bi vê pirsgirêkê re rûberû ye. Mirov dikare bêje ku bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê ne tirkî ne, bi baldarî nêzî vê pirsgirêkê bûne. Her weha dema bijişkên jin û mêr ji hev cûda bêne nirxandin, tê dîtin ku di bijişkên mêr de ev hestiyarî zêdetir dixwuye.

Dema pirsgirêkên ku bijişkên bi gorî zimanê xwe yê zikmakî bi taybetmendiya nexweşan ve girêdayî rûberû dibin werin muqayesikirin, tê dîtin ku bijişkên ku zimanê wan ê zikmakî tirkî an jî ne tirkî ye wekî hev bersîva "nexweşên jin, nexweşên ji navçe û gundan hatine û nexweşên ji 50 salî berjortir" dane. Ev yeka dibe ku bi kêmbûna perwerdeya nexweşan û kêm tirkî zanîna wan re girêdayî be. Her weha, mirov dikare bêje ku piraniya pirsgirêkên pêywendiyê ya bingehziman ji ber vê yekê derdikeve holê. Heke em bihesibinîn ku ev koma nikarin baş bi tirkî biaxivin, diviya bû ne bi bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê ne tirkî ne, zêdetir bi bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê tirkî ne pirsgirêk bijiyana. Ev yeka jî bi me dide nîşandan ku pirsgirêkên pêywendiyê tenê ji ziman pêknayên. Ji %70,0ê bijişkan li ciyê ku kardikin de zanîna zimanê herî zêde tê axaftin, ji bo wergirtina xizmet û çalakiyên tenduristiyê wekî pêşketinek dibînin. Tê zanîn ku haceta herî mezin ya pêywendiyê ziman e. Ji ber vê yekê divê wan kesên ku heman zimanê diaxivin gere baştir bi hev re bikaribin pêywendî bigrin. Bijişkên ku bi gorî zimanê zikmakî beşdarî vê raya han bûne, dibe ku ji hestiyariya wan ên "di pêywendiyê de ziman" derketibe holê.

Bijişkên ku zimanê wan ên dayîkê ne tirkî ne, "li ciyên kar bikim zanîna zimanê zikmakî girîng e" bi rêjeyekî bilind nirxandine. Pîşeya bijişkî xizmetkirinê, ji hemû însanan re wekî armancekî esasî dibîne. Her weha bijişk, di navbera însanan de ji alî ziman, dîn, nijad, bawerî ve çi cûdayiyek nikare bike. Heke mirov bi gor van esasa li meseleyê binêre di helwesta hin bijişkan de nakokî dixwuye. Dema mirov li bijişk û dermansazên ku bi gorî esasên pîşeyî dixebitin binêre, pirsgirêkên aborî, pirsgirêkên halet û avahiya bingehîn û pirsgirêkên burokratîk tê dîtin ku ji pirsgirêkên ziman pêşdetir girtine; ango bi gorî wan pirsgirêka ziman ne pirsgirêka sereke ye. Ev yeka bi bersîvên bijişkan ku tenê %17,7ê wan

dibêjin em di pêywendiyê de pirsgirekên bingehziman dijîn, serhev e. Di xebatên din ya ku bi awayekî berfireh tên dîtin de, ev rewşa wê dehî zêdetir zelal bibe.

ENCAM

- Bijişkên ku li Diyarbekir dixebin nêzî nîvê wan zimanê wan ê zikmakî ne tirkî ye. Nîvê bijişkan zimanê kurdî famdikin û diaxivin, ji ¼an zêdetir jî kurdî famdikin.
- Di pêywendiyên nexweş û bijişkan de her çi qas tirkî bi zêdetir were karanîn jî, karanîna kurdî û "kurdî+tirkî" bi hev re jî bi berfirehî tê dîtin. Gelek ji nexweşan dixawzin bi kurdî pêywendî bigrin. Li hember vê yekê bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê tirkî ne, demekî şûn de zimanê nexweş fêrdibin.
- Nexweşên ku bi heman zimanê zikmakî diaxivin, pêywendiyên xwe de zimanên xwe bikartînin.
- Ji bijişkan %17.7 bi piranî, %46.4 carina, her du bi hevre jî %64.1; ji dermansazan %26.2 her dem, %45.2 carina, herdu bi hevre jî %74.4 di pêywendiyên xwe yên bi nexweşan re tu pirsgirêkek zimanî najîn.
- Emir û zimanê zikmakî ya bijişkan, bandor li "pêywendiyê de pirsgirêka ziman" nake.
- Ji ber ku bijişkên jin kêm bbi kurdî dizanin, ew di pêywendiyê de pirsgirêkên ziman zêdetir dijîn. (%28,8)
- Bi gorî zimanê nexweşên ku dixwazin pêywendî bi bijişkan re bigrin, ji alî pirsgirêka bingehziman ya pêywendiyê de ew qas watedar nîne. Pirsgirêkên pêywendiyê yên ji ziman tên dîtin, tenê ji zimanên cûda bingeh nagre.
- Bijişk bi nexweşên ku tirkî nizanin re, bi karanîna zimanên wan, bi alîkariya nasên wan an jî bi alîkariya xebatkarên tenduristî pêywendî digrin. Bijişkên zilam zêdetir bi kurdî dizanin û bi nexweşên ku tirkî nizanin re jî ev yeka bikartînin.
- Pirsgirêkên ku bingeha xwe ji zimên digrin, di warê pêkhatinên pîşeyî yên wekî di "çirok girtin, nasîna nexweşiyê, tetkîka zêde xwestin, famnekirina dermankirinên tê pêşniyarkirin, pirskirinên nexweşan de astengî" de, bersîva Her Dem û Carina di navbera %3,6-%21,6an de tê dîtin. Bi gorî zimanê zikmakî ya bijişkan ev navber naguherin.
- Bijişkên ku zimanê wan ê dayîkê ne tirkî ne û yên mêr, ji pirsgirêkên ziman re zêdetir bi hestiyar in.
- Di pêywendiya bijişk û nexweşan de pirsgirêkên ziman, zêdetir bi nexweşên emrê wan ser 50 re ne, yên ji navçê û ji gundan tên û bi nexweşên jin re tê jiyîn.
- Zimanê dayîkê ya bijişkan di pêywendiyê de faktorekî girîng e.

PÊŞNIYARA DÎTAMÊ

1. Li herêmê di serî de yên kurdî dizanin, xebatkarên tenduristiyê yên ku dikarin zimanên din biaxivin divê bêne îstîhdamkirin û her weha divê piştgiriya vê polîtîkayê ji alî civakî û aborî ve jî were teşwîkkirin.

2. Divê di serî de fêrbûna bi zimanê kurdî, fêrbûna zimanên din ya xebatkarên tenduristiyê yên li herêmê bixebitin were teşwîkkirin. Ji bo vê yekê jî divê hevxebata zanîngehan, birêvebiriyên tenduristiyê, odeyên pîşeyî û saziyên din yên civakî were pêkanîn û vana, perwerdeya bi kurdî wekî erkekî bigrin ser milê xwe.

3. Bi taybet ji bo ku bikaribin alîkariya nexweşên jin û êxtiyaran bikin, divê di saziyên tenduristî de xebatkarên tenduristiyê yên bikaribin wergêrî bikin werin îstihdamkirin.

4. Ji bo ku pirsgirêka ziman ya di warê tenduristiyê de derdikevin holê ji binî were çareserkirin di pêvajoya perwerdeyî ya dibistanên tenduristiyê de (Bijişkî, Dermansazî, Bijişkiya Diranan, Dibistanên Bilind yên Pîşeyî yên Tenduristî û dibistanên din yên ku perwerdeyê tenduristî didin) fêrbûna kurdî û zimanên din yên li herêmê tên axaftin were hêsankirin.

5. Di hemû pêvajoyên başkirinê ya di saziyên tenduristî de divê forma ERÊKIRINan bi zimanê kurdî û zimanên din yên li herêmê tên axaftin werin amadekirin û dema ku nexweş daxwaz bikin bi zimanekî ku ew dizanin bi wan were xwendin û îmzakirin.

6. Di serî de li dermanxaneyan di hemû saziyên tenduristî de - li her derê- ji bo kesên xwendin, nivîsandin û tirkî nizanin divê pîktogram (famdariya wêneyî) werin amadekirin; her weha ji bo çareserkirinên pirsgirêkên pêywendiyên yên demî jî, saziyên pîşeyî yên tenduristiyê ev yeka bigrin rojeva xwe û Wezareta Tenduristiyê jî pêşvebirina pîktograman teşwîk bike.

7. Dermanên ku ji alî Wezareta Perwerdeyê ve hatine rûhsat kirin û li Tirkiyê jî tên bikaranîn, divê di prospektûsa xwe de cîh bidin kurteyekî kurdî ya li der haq karanîna dermanê.

8. Ji bo pirsgirêkên bingehziman ya pêywendiya navbera nexweş û xebatkarên tenduristiyê baştir were famkirin, divê lêkolînên berfirehtir were çêkirin.

PÊVEK-1:

DI TENDURISTÎYÊ DE PIRSGIRÊKA ZIMAN:
MÎNAKA AMEDÊ

ANKETA BIJIŞKAN

Ev lêkolîn ji alî DÎTAMê (Navenda Lêkolînên Civakî ya Dîcle) ve bi alîkariya Odeya Dermansazan ya Diyarbekir, Odeya Dermansazan ya Batman, Odeya Bijişkan ya Diyarbekir û Enstîtuya Civaka Vekirî, di pêywendiya nexweş û xebatkarên tenduristî de pirsgirêkên bingeh ziman hene an an, (heke hebe) ev pirsgirêka di wergirtina xizmetên tenduristiyê de heta çi radeyê bandora xwe li nexweş dike were pîvan hatiye çêkirin. Encamên lêkolînê wê bi raporekî bi raya giştî re jî were parvekirin. Di dema lêkolînê de nav nayen qeydkirin. Ji ber ku bêyî di bin banderokî de bimînîn bersîvên pirsan daye û beşdarî lêkolînê bûne, em sipasiya we dikin.

<u>Taybetmendiyên şexsî:</u>

1. Emrê te:
2. Zayenda te
    a. Jin b. Mêr
3. Rewşa medenî
    a. Zewicî b. Azeb
4. Salên xebatê:
5. Salên xebatê yên li Diyarbekir: ..... sal
6. Bernavê/a (Pisporî) te
    a. Bijişk
    b. Bijişkê pispor ya nexweşiyên hûndirîn *(pisporî binivîsînin)* :.....
    c. Bijişkê pispor ya nexweşiyên cerrahî *(pisporî binivîsînin)*: .....
7. Saziyê ku hûn lê dixebitin
    a. Nexweşxaneya dewletê
    b. Nexweşxaneya taybetî, saziya taybetî ya tenduristiyê
    c. Nexweşxaneya zanîngehê
    d. Pêla yekemîn (Navenda Tenduristî ya Jina, Navenda tenduristî ya Civakî, Navenda Tenduristî ya Zarokan, Dîspansera Li Dij Weremê,112 ûhwd.): *(binivîsînin)* .....
    e. Yên din *(nav an jî cûre binivîsînin)*: .....
8. Ciyê saziyê ku lê dixebite:
    a. Navenda Diyarbekir
    b. Navçeya navendî ya Diyarbekir
    c. Yên din *(binivîsînin)*: .....
9. Bajara te *(ciyê dayîkbûnê)* : .....
10. Zimanê te ya dayîkê:
    a. Tirkî
    b. Kurdî
    c. Erebî
    d. Yên din *(binivîsînin)*: ……

11. Zimanên ku hûn ji bilî tirkî dizanin

Ziman	Qet Famnakim	Famdikim lê nikarim biaxivim	Famdikim û diaxivim
Kurdî			
Erebî			
Îngîlîzî			
Yên din (……..)			

Agahiyên bi pêywendiyê ve elaqadar

12. Hûn bi piranî kîjan zimanê ve pêywendî bi nexweşên xwe re digirin?
    a. Tirkî
    b. Kurdî
    c. Erebî
    d. Yên din *(binivîsînin)*: ……
13. Hûn difikirin ku di pêywendiyên we yên nexweşan de pirsgirêkên ziman hene?
    a. Belê, her dem
    b. Belê, piranî
    c. Fikrekî min tune ye / Bê bersîv
    d. Belê, carina
    e. Na, pirsgirêk najîm
14. Nexweşên we bi piranî kîjan zimanî ve bi we re pêywendî digrin?
    a. Tirkî
    b. Kurdî
    c. Erebî
    d. Yên din *(binivîsînin)*: ……
15. Bi nexweşên xwe yên ku tirkî nizanin re, çawa pêywendî digrin?
    a. Bi alîkariya nasên nexweş em ji hevdû famdikin
    b. Dîsa jî hewl didim ku bi tirkî em hevûdû fambikin
    c. Bi alîkariya xebatkarên tenduristî em ji hevûdû famdikin
    d. Yên din *(binivîsînin)* : ……..
16. Nexweşên ku zimanê wan ê dayîkê ne tirkî ye, daxwaz dikin ku bi we re bi zimanê xwe yê dayîkê biaxivin?
    a. Belê, her dem
    b. Belê, piranî
    c. Fikrekî min tune ye / Bê bersîv
    d. Belê, carina
    e. Na, nabe
17. Heke hûn zimanê nexweşên xwe dizanin, nexweş fambike ku hûn zimanê wî/ê dizanin li hember we guherînek çêdibe an na?
    a. Hay dibim ku baweriya wî/ê zêdetir dibe
    b. Tu guherînek çênabe
    c. Hay dibim ku baweriya wî/ê kêmtir dibe
    d. Yên din *(binivîsînin)* : ……..

18. Bi gorî we li Diyarbekir pêywendiya nexweş û bijişkan de “pirsgirêka ziman” di çi astê de ye?
    a. Pir zêde ye
    b. Zêde ye
    c. Fikrekî min tune ye / Bê bersîv

d. Pir hindik e
e. Qet tune ye

19. Dema hûn ji nexweşên xwe yên tirkî nizanin çîrokên wan werdigrin bi astengiyan re rûberû dibin?
    a. Her dem
    b. Piranî
    c. Fikrekî min tune ye / Bê bersîv
    d. Carina
    e. Tu carî
20. Dema hûn bi nasîna nexweşiyên nexweşên xwe ve mijûl dibin ji ber pirsgirêkên ziman bi astengan re rûberû dibin an na? Her weha hûn bawer dikin ku ji ya pêwîst zêdetir wexta we diçe?
    a. Her dem
    b. Piranî
    c. Fikrekî min tune ye / Bê bersîv
    d. Carina
    e. Tu carî
21. Hûn difikirin ku ji bo nasîna nexweşiyên nexweşên xwe ji ya pêwîst zêdetir tetkîkan dixwazin?
    a. Her dem
    b. Piranî
    c. Fikrekî min tune ye / Bê bersîv
    d. Carina
    e. Tu carî
22. Carina hûn difikirin ku ji ber nezanîna ziman, we nasîna nexweşiyê de xeletiyek kiribe?
    a. Her dem
    b. Piranî
    c. Fikrekî min tune ye / Bê bersîv
    d. Carina
    e. Tu carî
23. Hûn carina difikirin ku ji ber pirsgirêkên pêywendiyê pêşniyarên we yên başkirina nexweşiyê nehatibe famkirin?
    a. Her dem
    b. Piranî
    c. Fikrekî min tune ye / Bê bersîv
    d. Carina
    e. Tu carî

24. Hûn dema şêwirmendiya nexweşên xwe dikin ji ber pirsgirêkên pêywendiyê bi tu astengiyan re rûberû dibin?
    a. Her dem
    b. Piranî
    c. Fikrekî min tune ye / Bê bersîv
    d. Carina

e. Tu carî

25. Nexweşên ku hûn bi wan re heman zimanî nikarin biaxivin, di famkirinê de çi astê de ne?
    a. Her dem famdikin
    b. Carina famdikin
    c. Bê fikir im / Bê bersîv im
    d. Kêmcaran famdikin
    e. Qet famnakin
26. Dema agahiyên we neyên famkirin, nexweşên we ji we pirsan dikin an na?
    a. Her dem dipirsin
    b. Carina dipirsin
    c. Bê fikir im
    d. Kêmcaran dipirsin
    e. Qet napirsin
27. Carina ji ber cûdahiya ziman hûn xwe ji wergirtina rayên nexweşan vedikşên an na?
    a. Her dem
    b. Piranî
    c. Fikrekî min tune ye / Bê bersîv
    d. Carina
    e. Tu carî
28. Ji alî zayendê ve bi piranî kîjan zayendê jêrîn ve pirsgirêkên pêywendiyê ya bingehziman dijîn?
    a. Piranî bi mêran re
    b. Piranî bi jinan re
    c. Di nava zayendan de cûdahiyek berbiçav tune ye
    d. Pirsgirêkên pêywendiyê najîm
29. Hûn pirsgirêkên herî zêde bi piranî kesên ku ji kîjan ciyan têne dijîn?
    a. Yên ji navenda bajêr tên re
    b. Yên ji navçe û gundan tên re
    c. Yên ji bajarên din tên re
    d. Di navbera ciyên rûniştinê de cûdahiyek tune ye
    e. Pirsgirêkên pêywendiyê najîm
30. Herî zêde bi kîjan komên emrî ve pirsgirêkên pêywendiyê yên bingehziman dijîn?
    a. Yên emrê wan 50 û ser wî re
    b. Yên emrê wan di navbera 24 û 50 de ne
    c. Yên emrê wan ji 24an biçûktir in re
    d. Di navbera komên emrî de tu cûdahiyek tune ye
    e. pêywendiyê najîm
31. Bi gorî we di kîjan navendên tenduristiyê de pêywendiyên pirsgirêkên bingehziman herî zêde tên jiyîn?
    a. Di saziyên pêla yekemîn de (Navenda Tenduristî Jin, Navenda tenduristî ya Civakî, Navenda Tenduristî ya Zarokan, Dîspansera Li Dij Weremê,112 ûhwd.)
    b. Di nexweşxaneyên dewletî de
    c. Di nexweşxane û saziyên tenduristî yên taybet de
    d. Di navbera navendên tenduristiyê de cûdahiyek tune ye
    e. Tu pirsgirêkên pêywendiyê naye jiyîn

32. Bi kerema xwe vê tiştên ku ez ê niha bixwînim çi qas beşdar dibin, bêjin: “Li ciyên ku bijişk lê kar dikin zanîna zimanê herî zêde tê bikaranîn di wergirtina xizmet û çalakbûnên tenduristî de dibe sedema pêşketinê.”
    a. Bi awayekî gelek pêşketî bandor lê dike
    b. Bi awayekî nebaş bbandor lê dike
    c. Tu bandora wê nabe
33. Hûn ji karkirina li Diyarbekirê memnûn in?
    a. Pir memnûn im
    b. Bi kêmayî be jî memnûn im
    c. Bê fikir im / Bê bersîv im
    d. Memnun değilim Memnûn nînim
    e. Qet memnûn nîn im
34. Bi kerema xwe ev peyvên ku ez ê niha bixwînim çi qas beşdar dibin bêjin: “Ji bo min li ciyên ku bikaribim bi nexweşan re heman zimanê biaxivim, girîng e.”
    a. Yeqîn beşdar dibim
    b. Bi kêmayî be jî beşdar dibim
    c. Bê fikir im / Bê bersîv im
    d. Beşdar nabim
    e. Qet beşdar nabim
35. Dema ku hûn karê xwe dikin pirsgirêkên ku rûberû dibin çi ne, bi kerema xwe bi gorî taybetmendiya giraniya xwe binivîsînin. *(Di nav qewsan de ji 1 heta 6 reqaman binivîsînin)*
    ( ) Têrbûna aborî
    ( ) Pirsgirêkên halet û avahiya bingehîn yên tenduristiyê
    ( ) Pirsgirêkên emnahiyê yên li nexweşxane tên jiyîn
    ( ) Pirsgirêkên pêywendiyê yên bingehziman
    ( ) Pirsgirêkên burokratîk û yên bingehmevzûat
    ( ) Yên din *(bi kerema xwe binivîsînin)*: ……..
36. Li bajarê me ji bo pirsgirêkên pêywendiyê bingehziman ya di navbera nexweş û bijişkan de pêşniyarê we çi ne?
    a. Li bajarê me pêywendiyên nexweş û bijişkan de pirsgirêkên ziman tune ye
    b. Divê xebatkarên tenduristî yên zimanê zikmakî ya herêmê dizanin werin şoxilandin
    c. Divê bijişk zimanê herî zêde tê axaftin fêr bibin
    d. Yên din *(bi kerema xwe binivîsînin)* :.....
    e. Tu pêşniyarê min tune ye
37. Bi ya we pirsgirêkên herî girîng ya Diyarbekir çi ne? *(Hûn dikarin ji yekî zêdetir xal hilbijêrin)*
    ( ) Pirsgirêkên emnahî
    ( ) Pirsgirêkên pêşketina sosyoaborî
    ( ) Pirsgirêkên bajarvanî *(hatûçûn, avahî, avahiya bingehîn ûhwd.)*
    ( ) Pirsgirêkên tenduristî
    ( ) Pirsgirêka kurd
    ( ) Pirsgirêka bêkarî
    ( ) Pirsgirêka Kêmaniyên jiyana civakî
    ( ) Yên din *(Bi kerema xwe binivîsînin)*: ……..

Anket qediya. Ji bo bersîên we em sipas dikin.

DI TENDURISTÎYÊ DE PIRSGIRÊKA ZIMAN:
MÎNAKA AMEDÊ

ANKETA DERMANSAZ

Ev lêkolîn ji alî DÎTAMê (Navenda Lêkolînên Civakî ya Dîcle) ve bi alîkariya Odeya Dermansazan ya Diyarbekir, Odeya Dermansazan ya Batman, Odeya Bijişkan ya Diyarbekir û Enstîtuya Civaka Vekirî, di pêywendiya nexweş û xebatkarên tenduristî de pirsgirêkên bingeh ziman hene an an, (heke hebe) ev pirsgirêka di wergirtina xizmetên tenduristiyê de heta çi radeyê bandora xwe li nexweş dike were pîvan hatiye çêkirin. Encamên lêkolînê wê bi raporekî bi raya giştî re jî were parvekirin. Di dema lêkolînê de nav nayen qeydkirin. Ji ber ku bêyî di bin banderokî de bimînîn bersîvên pirsan daye û beşdarî lêkolînê bûne, em sipasiya we dikin.

Taybetmendiyên şexsî:

1. Emrê te:
2. Zayenda te
    a. Jin b. Mêr
3. Rewşa medenî
    a. Zewicî b. Azeb
4. Salên xebatê:
5. Salên xebatê yên li Diyarbekir: ..... sal
6. Bernavê/a (Pisporî) te
    a. Bijişk
    b. Bijişkê pispor ya nexweşiyên hûndirîn *(pisporî binivîsînin)* :.....
    c. Bijişkê pispor ya nexweşiyên cerrahî *(pisporî binivîsînin)*: .....
7. Saziyê ku hûn lê dixebitin
    a. Nexweşxaneya dewletê
    b. Nexweşxaneya taybetî, saziya taybetî ya tenduristiyê
    c. Nexweşxaneya zanîngehê
    d. Pêla yekemîn (Navenda Tenduristî Jin, Navenda tenduristî ya Civakî, Navenda Tenduristî ya Zarokan, Dîspansera Li Dij Weremê,112 ûhwd.): .....
    e. Yên din *(nav an jî cûre binivîsînin)*: .....
8. Ciyê dermanxana te li ku ye?
    a. Navenda Diyarbekir
    b. Navçeya navendî ya Diyarbekir
    c. Yên din *(binivîsînin)*: .....
9. Bajara te *(ciyê dayîkbûnê)* : .....

10. Zimanê te yê dayîkê:
    a. Tirkî
    b. Kurdî
    c. Erebî
    d. Yên din *(binivîsînin)* : ……
11. Zimanên ku hûn ji bilî tirkî dizanin

Ziman	Qet Famnakim	Famdikim lê nikarim biaxivim	Famdikim û diaxivim
Kurdî			
Erebî			
ÎNgîlîzî			
Yên din (……..)			

Pêywendiya bi nexweşan re

12. Hûn bi piranî kîjan zimanê ve pêywendî bi nexweşên xwe re digirin?
    e. Tirkî
    f. Kurdî
    g. Erebî
    h. Yên din *(binivîsînin)*: ……

13. Hûn difikirin ku di pêywendiyên we yên nexweşan de pirsgirêkên ziman hene?
    a. Belê, her dem
    b. Belê, piranî
    c. Fikrekî min tune ye / Bê bersîv
    d. Belê, carina
    e. Na, pirsgirêk najîm
14. Nexweşên we bi piranî kîjan zimanî ve bi we re pêywendî digrin?
    a. Tirkî
    b. Kurdî
    c. Erebî
    d. Yên din *(binivîsînin)*: ……
15. Hûn bi piranî nexweşên xwe yên ku bi tirkî nizanin re çawa ji hevûdû famdikin?
    a. Bi alîkariya nasên nexweş em ji hevdû famdikin
    b. Dîsa jî hewl didim ku bi tirkî em hevûdû fambikin
    c. Bi alîkariya xebatkarên tenduristî em ji hevûdû famdikin
    d. Yên din *(binivîsînin)* : ……..
16. Nexweşên ku zimanê wan ê dayîkê ne tirkî ne, daxwaz dikin ku bi we re bi zimanê xwe yê dayîkê biaxivin?
    a. Belê, her dem
    b. Belê, piranî
    c. Fikrekî min tune ye / Bê bersîv
    d. Belê, carina
    e. Na, nabe
17. Heke hûn zimanê nexweşên xwe dizanin, nexweş fambike ku hûn zimanê wî/ê dizanin li hember we guherînek çêdibe an na?
    a. Hay dibim ku baweriya wî/ê zêdetir dibe
    b. Tu guherînek çênabe
    c. Hay dibim ku baweriya wî/ê kêmtir dibe
    d. Yên din *(binivîsînin)* : ……..
18. Bi gorî we li Diyarbekir pêywendiya dermansaz û bijişkan de “pirsgirêka ziman” di çi radeyî de ye?
    a. Pir zêde ye
    b. Zêde ye
    c. Fikrekî min tune ye / Bê bersîv
    d. Pir hindik e
    e. Qet tune ye
19. Dilden kaynaklanan sorunlar nedeniyle hastalarınıza ilacın kullanımını anlatırken zorlandığınız ya da gerekenden fazla zaman harcadığınız olur mu?

a. Her dem
b. Piranî
c. Fikrekî min tune ye / Bê bersîv
d. Carina
e. Tu carî

20. Hûn carina difikirin ku ji ber pirsgirêkên pêywendiyê ya bingehziman, nexweşên we di der haq karanîna derman û başkirina wê de ji we famnakin?
    a. Her dem
    b. Piranî
    c. Fikrekî min tune ye / Bê bersîv
    d. Carina
    e. Tu carî
21. Hûn qet difikirin ku ji ber pirsgirêkên pêywendiyê ya bingehziman nexweşên we dermanan bi awayekî çewt bikaranîbin?
    a. Her dem
    b. Piranî
    c. Fikrekî min tune ye / Bê bersîv
    d. Carina
    e. Tu carî
22. Hûn şêwra di nexweşên xwe de ji ber pirsgirêkên pêywendiyê ya bingehziman pirsgirêkan jiya ne an na?
    a. Her dem
    b. Piranî
    c. Fikrekî min tune ye / Bê bersîv
    d. Carina
    e. Tu carî
23. Nexweşên ku hûn bi wan re heman zimanî nikarin biaxivin, di famkirinê de çi astê de ne?
    a. Her dem famdikin
    b. Carina famdikin
    c. Bê fikir im / Bê bersîv im
    d. Kêmcaran famdikin
    e. Qet famnakin
24. Dema agahiyên we dayî baş nehatibe famkirin, nexweşên we ji we pirsan dikin an na?
    a. Her dem dipirsin
    b. Piranî dipirsin
    c. Fikrekî min tune ye / Bê bersîv
    d. Carina dipirsin
    e. Tu carî napirsin
25. Nexweşên we bêyî ku biçin bijişk tên serî li we didin û daxwaza dermankirinê ji we dikin?
    a. Her dem
    b. Piranî
    c. Fikrekî min tune ye / Bê bersîv
    d. Carina
    e. Tu carî

26. Bêyî ku nexweşên we werin derman ji we bigrin, nasên xwe ji bo derman stendinê dişînin ji we re?
    a. Her dem
    b. Piranî
    c. Fikrekî min tune ye / Bê bersîv
    d. Carina
    e. Tu carî
27. Ji alî zayendê ve bi piranî kîjan zayendê jêrîn ve pirsgirêkên pêywendiyê ya bingehziman dijîn?
    a. Piranî bi mêran re
    b. Piranî bi jinan re
    c. Di nava zayendan de cûdahiyek berbiçav tune ye
    d. Pirsgirêkên pêywendiyê najîm
28. Hûn pirsgirêkên herî zêde bi piranî kesên ku ji kîjan ciyan têne dijîn?
    a. Yên ji navenda bajêr tên re
    b. Yên ji navçe û gundan tên re
    c. Yên ji bajarên din tên re
    d. Di navbera ciyên rûniştinê de cûdahiyek tune ye
    e. Pirsgirêkên pêywendiyê najîm
29. Herî zêde bi kîjan komên emrî ve pirsgirêkên pêywendiyê yên bingehziman dijîn?
    a. Yên emrê wan 50 û ser wî re
    b. Yên emrê wan di navbera 24 û 50 de ne
    c. Yên emrê wan ji 24an biçûktir in re
    d. Di navbera komên emrî de tu cûdahiyek tune ye
    e. pêywendiyê najîm
30. Bi kerema xwe vê tiştên ku ez ê niha bixwînim çi qas beşdar dibin, bêjin: “Li ciyên ku dermansaz lê kar dikin zanîna zimanê herî zêde tê bikaranîn di wergirtina xizmet û çalakbûnên tenduristî de dibe sedema pêşketinê.”
    a. Bi awayekî gelek pêşketî bandor lê dike
    b. Bi awayekî nebaş bandor lê dike
    c. Tu bandora wê nabe
31. Hûn ji karkirina li Diyarbekirê memnûn in?
    a. Pir memnûn im
    b. Bi kêmayî be jî memnûn im
    c. Bê fikir im / Bê bersîv im
    d. Memnun değilim Memnûn nînim
    e. Qet memnûn nîn im
32. Bi kerema xwe ev peyvên ku ez ê niha bixwînim çi qas beşdar dibin bêjin: “Ji bo min li ciyên ku bikaribim bi nexweşan re heman zimanê biaxivim, girîng e.”
    a. Yeqîn beşdar dibim
    b. Bi kêmayî be jî beşdar dibim
    c. Bê fikir im / Bê bersîv im
    d. Beşdar nabim
    e. Qet beşdar nabim
33. Dema ku hûn karê xwe dikin pirsgirêkên ku rûberû dibin çi ne, bi kerema xwe bi gorî taybetmendiya giraniya xwe binivîsînin. *(Di nav qewsan de ji 1 heta 6 reqaman binivîsînin)*
    ( ) Têrbûna aborî
    ( ) Pirsgirêkên halet û avahiya bingehîn yên tenduristiyê

( ) Pirsgirêkên emnahiyê yên li nexweşxane tên jiyîn
( ) Pirsgirêkên pêywendiyê yên bingehziman
( ) Pirsgirêkên burokratîk û yên bingehmevzûat
( ) Yên din *(bi kerema xwe binivîsînin)*: ……..

34. Li bajarê me ji bo pirsgirêkên pêywendiyê bingehziman ya di navbera nexweş û dermansazan de pêşniyarê we çi ne?
    a. Li bajarê me pêywendiyên nexweş û dermansazan de pirsgirêkên ziman tune ye
    b. Divê xebatkarên tenduristî yên zimanê zikmakî ya herêmê dizanin werin şoxilandin
    c. Divê dermansaz zimanê herî zêde tê axaftin fêr bibin
    d. Yên din *(bi kerema xwe binivîsînin)* :.....
    e. Tu pêşniyarê min tune ye

35. Bi ya we pirsgirêkên herî girîng ya Diyarbekir çi ne? *(Hûn dikarin ji yekî zêdetir xal hilbijêrin)*
    ( ) Pirsgirêkên emnahî
    ( ) Pirsgirêkên pêşketina sosyoaborî
    ( ) Pirsgirêkên bajarvanî *(hatûçûn, avahî, avahiya bingehîn ûhwd.)*
    ( ) Pirsgirêkên tenduristî
    ( ) Pirsgirêka kurd
    ( ) Pirsgirêka bêkarî
    ( ) Pirsgirêka Kêmaniyên jiyana civakî
    ( ) Yên din *(Bi kerema xwe binivîsînin)*: ……..

Anket qediya. Ji bo beşdariya we em sipas dikin.